# Xeca berlînî

## Roman

Hesen Îbrahîm
11 . 11 . 2008
Nürnbêrg

-1 –

- Navê min şêrûye..Heval dibêjne min şêr.
Jiber zîrekî û mêranyên min!
Lidur xu zifirî kes nedît bawer jê bikit.Şerm kir.
- Bibure,navê min yê rastî reşûye.Xelkî digotine min reşku.
Dengê xu nizim kir.
- Reşku yê êtîm,reşku yê şivan.
Serê xo şor kir,kasêta mejyê wî,kete karî. Bîrdanka xu ya reş vekir.Berî xu dahêlte kuratîya rojên nexoş.Berî tijî goha kenîya wan biçûkên çivêl,ewên yarî pê dikirin bibit.
- Reşku yê bê xudan..
Şivanê nêrî û beran.
- Şelê wî yê dirîyaye..
Şîva wî digel ya saye.
- Mala wî pişta lîse..
Difina wî ya bikilmîşe.
-Reşku reşku bextê te.
Heker bû noba me..
-Tû newe mala me.
Dilê me dê reş bit..
Xwarina me dê nexoşbit...

Divîya dest dite gopalê xu û birahêlte kuma wan.

Dengê girtinê ji dergehî hat.Zanî ew herdû polîsên milên wî girtîn çûne derê.
Kes nema digel wan.
Kete beranberî wî dêmê befirîn,wan çavên şîn,wê pirça zêrîn..
Dû sê caran çavên wî ketine tora çavên wê yên tijî hîvî û bişkurîn.Neşîya xu liber megnatîsê awrên wê yên tijî pirsîyar bigirt. Her zû çavên xu ji agirê lêvên wê yên sor vekirin.
Çavên xu litiştekî dî gêran.Zendên xu perxandin.Cihê kelamça sor bibû..
Sêra çavên wî kete wê kuma kaxezên liser mêza dinavbera wanda.
Mêz ya dinîva joreka mezin û lêkday da. Herweku ew jor jibû wî amadekirî.da xudana çavên şîn çavzilkanê digel bikit û mayê xu Dihemû hur ü girên jîyana wî da bikit.Tijî wan kaxeza xwîna birînên wî bikit.
Serê xo bilind kir,berê wî kete wî kevalê bidîwarê lidestê wî yê çepê hilawîsitî. Wênê daykekê ya şîrî didite biçûkî xu yê sava.
Bîrdanka wî peqî...
Xecê pişta xu ya daye lanka kiça xu. benduşka sîngê xu vekir.Hinareka sipî jê îna der.Serê wê yê rengê hingivînî kire didevê kiça xu ya sava da.
Destê xu bire paxla wê,memkê dî îna der. Devê xu havête bişkujka wî,wek biçûkek sava memkê xecê mêt.
- Ez jî savayê teme.Min jî şîr divêt.
Kenîya wan tijî gondî bû.Pêlên wê gehiştine jora wan.Dêmê şêru nexşandin.
Xudana pirçê çend serqelem jikenîya wî tumar kirin.Zanî yê lirojên burî dijît.
Dengê qelem û kaxezan.berê wî da wê pencera mezin ya liberanberî baxçekê ciwan û lêkday.Tijî çava ronahî bû.Digel tîjkên bînahîya çavên xu dişuşa pencerê ra derkete cîhana azadîyê.
Jîyan dikuka xoşî ü berxodanê daye. Deng û livîn goha disimin.
Biwê cada mezin û tijî jîyan,jurda çû xwarê.Bazar yagerme.Hîvî diavizin.
Paşeroj ya arîyaye.Tijî dest ü ber milên hemüyan dîyarî û tiştin.
Kenî jipaxlên firîşta wek befira serê sala dibart.
Qelem kuxî..Hizirên wî revîn,wek mişka xu veşartin.
Serê xu şorkir.zanî ew hizir û ew hîvî ne mavê wî bûn kirîn.Zanî ew ne hejî wê jîyanê ye.
Berê wî kete rexê rastê yê jorê.Çavên wî ketine wî kevalê mezin.
Îsa pêxember yê xaçkirî ye,tijî rexa firîşte û qotabyên wîne.Hemû yên jitirsa diriçfin,çu jikesê naêt.Kes harî nakit,kes jixaçkirinê rizgar nakit.Kes mayê xu dikarê xudê nakit.
Dengê îsay bilind bû....
- ew xudayê ez hinartîm,jibu hişiyarkirina hewe!ew berpirse ji xilaskirina min!

hün xema min nexun.tinê bizanin,ez kurê xudê me...
Kaxez livî,qelem siwarê canîyeka şemboze. Mejyê wî yê belav,kum kire ser wê mêza tijî kaxez...
Deng ji wê telefona rengê sor hat.Bidestê çepê da bergohê xu.Telefon digel destê wê dibin pirça zêrîn ve berze bûn.Tinê bişkurîn û sipêde baş jilêvên sor barîn.
Şaşa kumpîwterî rexekê mêzê yê girtî.Perdxa ava libersîngê wê peqşik yên biser dikevin.
Dilê wî na çite vî rengê avê.
Her ava henefîya nav malê vedixwar.
Xecê digotê.Her dê mînî reşoyê şivan.Her dê digel pezî û seyê xu ava cûya vexwy...
Serê xu bilind kir,dû çavên şîn yên libenda wî. Vîya hêşta xu mijûl bikit.Dengek dijwar ji kaxezekê hat,qelemî hindek peyv nivêsîn. Zanî ya lihîvîya wî,zanî qelem yê livîn û axivtinên wî tomar dikit.Zanî bêhna wê gelek ya firehe,lê nabit roja xo hemüyê bihizir kirinê ve biburînit.
- Birastî ez nizanim kengî jidayik bûyme!
Qelemî lez kir..
- Kes jî rastiyê nizanit.Min çu nasname nînin.
Çavên xu neqandin.Her weku hizireka kûr dikit.
- Gondyên me digotin.Tû wê şeva gondê me hatîye sotin,libnê gelî libin tiraşekê jidayik bûy.
Wek ferza nivêjê,rojê dûcar ew bin tiraşa lê jidayikbûy ü ew kefirê dayika wî libin şehîd bûy,zîyaret dikirin.Bû digirîya,dibû pistpsta devê wî (dua)dikirin.Ew herdû cih,bu wî mezarên pîroz bûn.Cihê bêhnvedana wî bûn. Xem û wastîyana wî lê vedirevîn.
Serê xu bilind kir,çavên xu vekirin,her weku lidujmnê xu digert.
- Piştî demekî kêm firokên dojmnî dayika min digel komeka gondîya kuştin.
Devê xudana pirçê peş bû.Ew çavên şên zîq bûn.Qelem dinav wan tilên xeyzeranî da har bû.
- Wek gondîya digot.Babê min pêçolka min da bersîngê xu û revande dişkevtekê ve.
Çavên wî ketine wî dêmê dinav wê pirça zêrîn da berzebûy.Her weku dilê wî pê sotî.
- Çîrok dirêje.Dê serê te pêve êşt.
Serê xu jinav wê sîlava zêrî bilind kire enîya wî ya girê.Qelem sist bû.Deng jikaxezê nehat.

Ma lihîvîya lêvên wî yên dibin rîh û simbêla ve berze bûyin.
- Ez hind dizanim,dijyê Dûsalîya min da.babê min dişerekî dijî dagîrkerên welatê meda şehîd bû.
Jor bê deng bû.Qelem kete ser sîngê kaxezê.
Ew tilên gerdena qelemî digivaştin,da jehra xu darêşite ser kaxezê.Têkhatin,ü têkçûn. Behîya şehîd bûna babê wî û ya dayika wî gêran.
Til û destan,xu havêtine êk.Rondik barandin. Sirudên nîştmanperweriyê  gotin. Til,Belavbûn.Kum bûn.Birîyar dan xebat berdewam bibit.
Serê sê tila gehişte wê perdaxa tijî av.Bilind kire wan lêvên sor.Wek sîlaveka har,diwê gerdena wek şûşey,jorda hate xwarê.
Perdax kete ser mêzê.Dengê peqîna moşekekê jê hat.
Tila biser şorîve,qesta gerdena qelemî kirin. Wek gerukekê birsî.Man lihîvîya lêvên wî yên qeşavî.
- Nizanim çewa ez mezin bûyme!Ü kê ez xodan kirîme?
Hizir têkelî suhbeta wî bûn...
- Tinê ez dizanim,demê ez bûyme genc.Dibû şer dinavbera mala Mamên min û ya xalên min da.
Çûnemabû suhbeta wî bibite hizir..
- Pismamên min digotin.Reşku xwîna me ye, divêt bibite şivanê me.Xalên min digotin. Reşku yê me ye,dê bite şivanê me...
Min çu desthelat nebû,min nedişîya çu birîyara bidim.
Muxtar û hindek rû sipîya mayê xu têkirin. Herdû binemal pîќ înan.Ez bûme şivanê herdû binemalan.
Hizirê ser ji suhbetê stand.Kete zifiroka hizireka dijwar.Tijî goha dengê pezî bû.Zengila beranê tovî ser lê hêrkir.Rewîna seyê gewir,pez kum dikir.
Kenîya xecê jîya hemû bêrîvana cûda bû.
Xu veder kir.Çavên reş lidelîvekê digerîyan. Da silav kite pismamê şivan..
Jor bê deng bû.Pêrîvan zifirîn gondî.Pez kete zîyanên xelkî.Rewîna seyê gewir.hizirên wî kirine helim û bilind kirine banê jorê.
Serê xu bilind kir.Dû çavên şîn yên hizirên wî kitkte wek kezîya divehînit.
Cihê xu xoş kir.deng jigewrîya xo îna.
- Heta lisipêdeyekî min pezê xu ligelîyekî diçerand.Hindek limin bûne mêvan. Çend çekdarek hatine hindav serê min.Silav kirin.daxwaza harîkaryê jimin kirin.
Min zanî pêşmergene.Liwî demî pêşmerge dikêm bûn.
Hevalekî wan yê birîndar bû.Pîtivî dermana bûn.
Serê xu bilind kir.Da bizanit ka xudana pirçê daxivtinên wî digehit?!

Zanî çu peyv û livîn û hizir,jikafirê qelemê wê rizgar nabin.
- Piştî zanîn ez kurê şehîdî me.Gelek keyiva xu bimin înan.Kaxezek dane min,ez hinartme bajêrî.Linik hevalekê xu.Ew mane liber pezê min.
Her bilez wî hevalî ew derman amade kirin û digel min heta nêzîkî cihê wan hat.
Min derman dane wan,hevalê xo derman kirin.Piştî çend roja çûne ser rêa xu.. Lê rengê wan,suhbet û lêkdana wan.Liser hizra min neçûn.Ez bûme aşiqê dîtina wan..
Her çend rojeka dihatine seredana min.
Ez dihinartme bajêrî,jibû karekî yan gehandina nameyekê...
Ez dirêj nakim.Lirojekê min xu digel wan dît.
Ez bûme pêşmerge.
Min gond û pez û xecê hêlan...
Peyva xecê,qelemê xudana çava rawestand. Serê xu yê dinav wê pirça zera pelav.Bilind kire navçavên wî yên girê.
Deng jikaxezê nehat.Qelem bê deng bû.Serê xu bilind kir.
Çavên wî ketine dû pelên geş.Her zû carekadî serê xu şor kir.
Kenîya xeçê,livîn û çivêlyên wê,diserîda wek fîlmekê reş û sipî kar dikir.
Bê deng bû,neliv ma,dinav hizirkirneka kur da berze bû.Gelek bîrkirin.Gelek wesa ma.Divîya hizirên wî tinê bû mawê çend çirkeka bibine rastî.
Careka dî çepekê lixo bidit.Xo jibêrîvana vedizit.Libin wê darberoya hercar.xecê bikite dinav sîngê xoda.tijî sîhên xo bêhna memkên wê bikit.
Yan bila erd şeq bibit û dinavda biçite xwarê.
Gelek ma.Ne xecê hat û ne erd şeq bû û ne ew çavên şîn jiçavên wî yên wastîyay vebûn!
- Ez....Ez Mam digel wan.Bûme pêşmerge.Em dikêm bûn.Karekê giran liser milên mebû.Em toşî gelek şer û pêkdadana bûn.
Min rolê xu bimêrane dinav hevalanda dîyar kir.Ez bûme xoşmêrê şoreşê.
Serê xu bilind kir,çavên wê yên dinav pirça zerda berze bûyin.Ya şivtana liteniştên qelemê xu didit.
- Jiber zîrekî û mêranyên min.Hevala navê min kire şêr...
Berê xu da xudana pirçê,ka bawer jê kî yan ne...!
Xodana pirçê tinê awrîyek dayê û zifirî şerê qelem û kaxezê.
- Nav ü dengê min belav bûn.Ez bûme şêr. Kesê ne gote min reşu,yan reşku.Reşu û reşku mirin.Heta min bixu jî navê xu yê dirust jibîrkir.
Wek bêhnvedanekê da xu.Her weku divîya tiştekî bînte bîra xu..

- Rojekê rêya me digondê me ket.Min xu jihevala dûr kir.Ez çom ser kanîya gondî.Cihê jivanên min ü xecê.Ez Mam lihîvîya xecê min zanî dê her êt.Dê her bînim.
Mirada min hasil bû,kenîya xecê jidûr hat. Dengê wê,kenîya wê,jîya hemü kiçan coda bû.
Min xu dirêya wêda veşart.Heta delîve ketyê. min destê wê girt û bire pişt tiraşekê.Keyifa wê gelek hat,xu dinav sîngê minda heland.
Em bûne êk leş.
Heval lihîvîya min bûn.Wê nehêla ez bigehime hevalan.
Got yan mirin yan ez jî dê digel hewe êm.
Min divîya wê êvarê xecê birevînim.Lê heval razî nebûn.Gotin em dê xwazin,heker babê wê razî nebû,ya hewe bivêt wê bikin.
Me karê xu wê şevê hêla û em man ligondî. Me xecê jibabê wê xwast.
Keyifa babê wê gelek hat.Jiber ez pismamê wê me û mêrxasekê binav ü dengbûm.
Tilên xo têkraçandin..
- Ez dirêj nakim.Lidemekê nêzîk,em bûne bûk ü zava.Jîyaneka xoş û pirî hîvî û omêd liberahîya me bû.
Ez diçûm karê xu digel hevala.xecê dima lihîvîya min.Lirojên bêhnvedanê me ligondî dibûran din.digel heval û kes karên xo.
Piştî salekê,ez bûm babê evînê.
Kiçeka ciwan û şirîn jidû evîndaran.
Ew kiç bû hemû jîyana min,gelek rengê dayika xu xecê dida..
Dîsan xudana çava deng jiqelemê xu îna. Bidû çavên tijî pirsîyar çavzlkanê digel çavên wî yên jixewê xerîb kirin!
Serê xu şor kir,bersiva pirsîyarên wê hate dan.

- Lisala duwê,ez bûme babê kiçeka dî.
Me navê wê kire jîyan.
Likamlana biharê hate ser dinîyayê.Jîyana me kire bihareka xemilandî..
Çîroka min gelek dirêje,dê serê te lê bite êş.
Ez dê kurt kim..
Awrîyek dayê û zû zifirî karê xu.
- Piştî gelek şer ü pêkdadanan digel dojmnî.
Ez bisextî birîndar bûm.
Jiber seruberê şoreşê û nebûna derman û dixituran.Ez hinartme dervey welatî.
Biharîkarîya şoreşê,ez hatime elmanîya.Liberlîn ketime xesteka taybet.

Piştî demekê dirêj,ez sax bûm.Lê bûme nîve mirov.Min neşîya çu kara bikim.Min neşîya vegerm nav şoreşê.Destê min seqet bû.
Ez neçar bûm,li elmanîya daxwaza mavê penaberyê bikim.
Piştî dû salan,ez wek penaberek sîyasî hatim wergirtin.
Gelek pê çû heta min şîyay xecê û herdû kiçên xu,evîn û jîyanê bînime elmanîya..
Lê piştî gehiştîn.Dîsan em ketin dixoşîyeka mezinda.Dîsan evîna me nû bû,dîsan em bûne aşiq.
Lê jîyana gondê me yê,Dizikê gelîyekê asê û jibîrkirîda.Libin top û firokên dûsê dojmnanda. Pirs û tirs û bê karî.Jigondekê bê rê û kareb xwandingeh.Ligondekê çend malên hejar.
Êkser.piştî çend Rojeka,em liberlînê,li nav mirovayetî û pêşketina bê dawî hişîyar bûn....
Me neşîya bawer bikin.Me ne dizanî hindek mirov dijîyaneka wesa xoş da dijîn?!Me dinîya ne dîtibû.
Min hindek gond û bajêr dîtibûn.Lê xecê ji gondê me zêdetir nedîtibû..
Erê....Jigondekê libinê çîyayekê asê,dûr ji hemû pêşketin û mirovayetyê.Em bûne xelkê berlînê.
Tû baş cîyawazîya em ketînê dizanî!
Em hêr kirin.Em ketin dizifirokeka dijwarda.
Zimanekê coda.Mirovên coda.Seqayekê coda.
Hemû tişt dicoda bûn.Me her nedizanî ku cihek hosa coda lidunîyayê heye!
Min şîya xu liber bigirim.Min pê lidilê xuna.Min xu jixoşîya dûr kir.Min şîya xu.
Lê..xecê her zû destên xo bilind kirin.Bû êxsîra xoşî û pêşketinê.Xu liber negirt.Kevilê xo gohart.Xu berda dinav pêla bileza pêşketinêda.Piştê demekê kêm wek elmana seredерî dikir.Çavlêkirinema kore dikir.
Herzû jimin dûr ket.Jiber jîyê wê yê biçûk.Û mejyê wê yê zelal.
Zû kete ser rêyekê.Birîyar da,xu jibinîyatî bigohurt.Bibite miroveka dî.
Bibite elman.Gelek hewil dan min jî bigohurt. Kerestê min yê req bû.Neşîya.Ez hêlam,xu biminve newastand.
Kiçên wê dibiçûk bûn.Her zû hatine ser rêya wê.Hemû jimin dûr ketin.Ez Mame bitinê.
Her zû fêrî ziman û karî bûn.Ez hêlam liber malê.Jiber destê min yê seqet.Min ne şîya cu karan bikim.
Ez bûme zelamê ber malê..
Lisalên êkê û duwê jihatina xecê.berî jimin dûr kevit,dû kur peyda bûn.Welat û Kawe.

Pştî xecê didinîyayê gehiştî.Ez diwê negehiştim Ew dimin negehişt.Em jêk dûr ketin. Peywendîya me sist bû.
Taybet piştî xu jibçûka xilas kirî.
Birîyar da biçûka nebit.Jîyana xu wek wê divêt birêve bibit.Tiv kire pişt xo,tiv kire wan rojîn birs ü tirs û dûr ji cîhangeryê tiv kire wan rojên jijîyê wê bûrîn.
Wek wê digot,jîyana min ji evro dest pêdikit.
Ez kiça evro me.Ez evro jidayik bûyme..
Min neşîya jibirîyara wê lêve bikim.Min çu desthelat liser nema.
Rojekê bêy min çû dixitorî û xu jibçûka xilas kir.
Hate mal,digel kiçên xu ahengek danan. Keyifa wê gelek hat.
Jiwê rojê,arêşên me dest pê kirin.Em bûne neyar.Min nevîya çavên min biçavên wê bikevin.Bû wê her ne xem bû.Çu tişt bû wê ne xem bûn.Ez liber dilî reş bibûm.Pîte bimin ne dikir.Diçû karî û dihat.pare dimezaxtin,kirîn û bazar dikirin.Her nedizanî ka ez Heme yan ne.
Ez dimalêda bibûme pîvazeka rizî..
Serê xu şor kir.Dûsê rondik jiçava jorda dinav rîhên wîda berzebûn.
- Kiçên xo wek xu vêrkirin.Mal jidest min derket. Hemû tişt jidest min derketin.Tinê min mavê xwarin û nivistinê man.
Herdemê min xu nerazî dikir,digot.Rûne ser kurîya xu.Ez yate xodan dikim.Heker ne bidilê te ye.Keremke wêhe dergehe?!
Çu mêranî jimin nedihat.Yasa û polîs digel wêne.Kiçên wê digel wêne.Kur weku wêne. Tinê ez yê cûdame.Divêt razî bim yan derkevim.
Wastîya.Devê wî hişik bû,destê xu havête perdaxa avê.Dengê gewirîya wî tijî jor bû. Qelem kete ser kaxezê.
Piştî bêhinvedaneka kurt.Çavzlkanê dest pê kir.
Ew çavên sorên tijî xew û xem.Ketin wan çavên şîn yên tijî hîvî û jîyan.
Lêva huçkê xu disimbêlên xu husîn.Serê xu şor kir..
**
Dengê firokên şerî jiçîyayê gare biser ket.
Deng nêzîkÎ cihê wan bûn.Heval bijale bûn. Her êkî xu havête pişt berekî.Berê çekên xu dane esman..
- Şêru xu veşêre..
Dinav gîyayê biharêda,kete ser teniştê..
- Ew jihndê kêm tirin ez xu jiber wan veşêrim. Heker mêrin bila peya bin.
Deng jidevê çekê wî hat.Dukêl jibinê firokê derket.Li esmana bû gumtilekê agirî û jorda parçên wê hatine xwarê...
Tijî gelî tilîlî û hewarên hevala bû.

- Dest xuş şêru...Her bijît şêruu.....
**
Kaxez livî...Qelem kuxî...
Şêru kete beranberî rastîyeka tal.
Destên xu têk husîn,serê xu Xurand,cihê xu xoş kir.Çu gihurîn neketine cihî.Çavên şîn her dizîq bûn.Qelem wek tajyê nêçîrê lihîvîya fîta wî bû.
- Ez ketime ber destên xecê û kiçên wê.
Min çu nema bû bijîm.Tinê min mafê hindek para hebû jibû cigare û çayxanên min.
Ew jî roj bû rojê kêm dikirin.
Digût çigara ne kêşe dixirabin.Gelek ne çe çayxanê,hevalînîya püça neke,hevalînîya kurda neke.
Xecê sipêdê diçû karî,gelek çaran bişev jî ne dihate mal.
Dema min pirsîyara karê wê dikir,yan ka likîve bû?!
Digût.Ew ne mavê te ye.Tinê heker parên te neman.Hingê daxwaza hindek para bike.Û mayê xu dikarên meda ne ke.Tezanî?
Bêhinvedanek daxu.Her weku dideftera hizirên xu da litiştekî digert...
- Evînê zû şû kir.Ez jê tena bûm.Herçende mêrê wê ne bidilê min bû.Min nedizanî ka çi kese? Ka çi dîne?Ka çi rabirdû heye?
Tinê xecê razî kir û digel çû!
Jîyan wek dayika xû ye.Heta axivtin û cil ü lêkdan û rêveçûn.
Min çu jikarê wê nedizanî.Gelek caran sê çar şev û rojan ne dihate mal.Min pirsîyar dikir. kesê rastî bû min nedigût.
Tinê xecê digût,karê wê hindê dixwazit.Bela xu jê ve ke.
Herdû kur biserê xu ketin.Fêrî cigare û gelek şaşyên vî welatî bûn.
Gelek caran bêhina min teng dibû,min gazinde dikirin.
Xecê bersîngê min digirt..
- Bela xu jibiçûkên min veke.Bila bû xu bijîn. Bila wek te ne bine golik...
Jor bê deng bû,qelem girêl bû ser sîngê kaxezê.Kaxez dibin peyvên giranda wastîyan. Perdaxên avê vala bûn.
Deng jidergehî hat.Dû polîsan milên wî girtin. Lipêş wan çavên şîn kelamçe dizendên wî girêdan.
Heta berdergehî lidûyif çû.Bikenîyeka şirîn, xatir jê xwast...

2 –

Dergeh lipşt hate girtin.Kete ser cihê xu.Serê xu dana ser Balîfka sar.Pîte bikesê nekir.Silav nekire hevala.Bersiva çu pirsîyaran neda. Hevala derdê wî dizanî.Hêlan bû hizir û xeman.Berze bû,kete zifiroka leşê wastîyay û hizirên şêlî.
Geh xav bûn.Xew har bû.Cih ker bû.
Xecê jigondî beref mexelê pezî hat.Kirasê xu yê gulgulî,jikelem û kêrata vedikir.Diber ra bejna xu diçemande kulîlik û davên gîyay. Dikirine destik û bidengê xu yê mê.Gehên mêranîya wî di azirandin..

- Lulu pismamû dutmama te me.
- Bu xelkî binexitim bute biherwe me..

Destkê kulîlka didesitîda,dû sê kitek dahêlane diber perçema xura.
Biserê tilên xu pirça xu ya reş û dirêj şe kir.
Berî silav kite pismamê şivan.Lêva kirasê xu ji ber doxîna xu berda xwarê.Lewendiyên xu liser milên xu şidandin.Dû sê cara pişkurî,lêvên xu kezandin...
- Êvar baş pismam...
Xwîna dilê wî bû volkan.Çend qirêja digehên wîda digel pêlên xu yên dijwar birine dilî...
Bêî bersivê bidit.Rünişte ser berekî libin sîbera darmazîya.
Çav digel çavan axivtin.Dest digel destan, heta gera lêva hatî.
Rewîna seyê gewir,jidavên xoşyê rizgar kirin. Rabûn ser pîya,xu dûrî êk kirin.
- Eve bipirîvan hatin...!
- Bila bên Mame çi kirîye...?!
- Bila me digel êk ne bînin.
- Ne tirse..Tû bû minî û ez bû teme..
- Raste.. Lê...?
- Lê çi? Ha..?
- Here dûr keve.Bila kes me husa nebînit.
- Ez jikesê natirsim.Lê jiber xatir çavên te eve ez çûme dûr.
- Dê here zûbe eve hatin..
Deng jidergehî hat.
Dû polîsa milên wî girtin.Kelamçe kirine zenda, beref cihekê dî birin..

— 3 -

Liser kursîka her car rünişt.Destên wî ji kelamça azad kirin.

Xwarina sipêdê danane ber sîngî.Dergeh lipşt girtin.
Jor bê deng bû,xudana çavên şîn nehat. Çavên xu lihemû kun û qolaçên jorê kêran, her weku eve cara êkê ye vê jorê dibînit.
Hindek ava tezî berda gewirîya xu ya hişik.
Ma lihîvîya xudana pirça zer.Dû sê caran lidûr xu zifirî,kes nedît.
Rabû ser pîya,linîva jora mezin hat ü çu..
Hest bazadyê kir.Xu jêk vekêşa,tijî sîhên wî oksîcîna paqij bûn.Hest bibirsê kir.Lixwarina xu zifirî,her jipîyave çend parîyek xwarin.Tameka taybet jê hat.
Xwarina xecê hate bîra.
Roja êkî xecê xwarin bû dirust kirî.hind xwar heta bersojê girtî.Dû roja nesax bû.
Liser kursîkê rünişt.Çavzlkanê digel perdaxa avê kir.Melay digût,herame mirov avê biperdaxa vexut.Perdax bû aêraqê yên dirust kirîn.
Dergeh vebû.Bejneka bilind,dû çavên şîn, pirçeka zêrîn hate jor.
Tijî ber sîngê wê yê mê,kaxezin.Barana kenî û bişkurînê jidevî dibart.Hîvî û umêd ji çava dizên.
Ew jora mirî û bê deng,tijî livîn û jîyan bû.
Kaxez danane ser mêza dinavbera wanda, liser kursîka xu rünişt.
Tila şehdê dana ser dukma kumputerî.Ma lihîvyê heta geş bûy.
Dû sê awiryên tijî hîvî danê.dest da dû sê ekta vekirin çend serqelemek nivêsîn.Carekadî danane cihê wan.Ekteka sor jê girt liber sîngê xu vekir,qelemê reş jiçanta xu ya hercar rengek,wek rengê çilkên wê îna der.Havête ser kelexê wan kaxezên dinav wê ekta sorda.
Perdax tijî av kir,dûsê qorç lêdan.Carekadî, perdax dana ser lêva mêzê.Lêvên xu yên ter, bipirteka kilînsê zuha kirin.
Tilên zirav bezîne gerdena qelemî.Şer bidû çavên tijî pirsîyar,digel dêmê wî yê rengê mirîya dida kir.
Jor bê deng bû.Serê xu şor kir,çavên xu neqandin.Nezanî dê çewa dest baxivtinê kit? Nezanî dê çi bêjit?
Hemû tişt jibîr kirin.Mejyê wî bû kaxezeka sipî.
Wek diza çavên xu vekirin.Hêşta dû pelên geş agirê jê dipeşt.
Serê xu xurand,yarî bitilên xu kirin,cihê xu xoş kir,kuxî,lidur xu zifirî.Gelek hewlên xumjûlkirinê bikarînan.Neşîya wan çavên wek derê dû çeka stêrka xu li enîya wî girtîn,dûr bêxt.
Neçar bû deng jigewirîya xu îna..
- Wek min gotî.Xecê û kiçên xu,pîte bimin nekirin.Ez ji jîyana wan derketim.Tinê xwarin û nivistin min liwê malê man.

Xwarin digel min nedixwarin.Min bermaya wan dixwar.Nivistina min jî ya cûda bû.Ez lijora mêvanan dinivistim.
Dilê wan jimin reş dibû.Digotin dema tû xwarinê dixûy,deng jidevê te diêt.Dilê me reş dikî.
Her cenide,lidû sê roja carekê limal xwarin amade dikirin.Her xwarina wan liderê bû.
Hizireka giran serê wî şor kir..
- Ew demek dirêj bû xecê ez jijora nivistina xu kirbûme der.Digel min nedinivist.
Digot.Tû linik min nanivî..Tû bişev xirxirê dikî.Te xew limin heram kir...!
Jin û mêratîya me tinê wêne bû.Ew wêne jî roj bû rojê dihejîya.
Min gelek xu ragirt,min gelek xu asê kir.
Cigare û telefzîwnê,neşîyan demê min yê bê kar û xemên min yên giran sist kin!
Ez litiştekî dî gerîyam.Ez lixomjül kirinekê gerîyam.da demê xu pê bikujim.Da xemên xu pê sist bikim.
Ez fêrî vexwarinên kihulî bûm.Ez û şuşa aêraqê bûne heval,bûne evîndar.Min neşîya jê dûr kevim.Wê jî ez digel hindek hevala dame nîyasîn.Em her roj êvara dinav baxçekî yan liber lêva cadekê kum dibûn.Hevalînîya wan, gelek jixemên min sist kirin.Min hemû tişt jibîr kirin.Mal bû min wek hotêlê lê hat.Dema min nevîyaba biçime mal.Berdîwarekî hîvî ji min dikirin.
Lê... Lê...
Bê deng bû,serê xu kire dinav destên xuda. Enîya xu perxand...
Xudana çavên şîn.Qelem dana ser kaxezê.Dû qorç lavê dan,bêy çavên xu ji enîya wî vekit!
- Ne wan hevala û ne wê şuşa aêraqê şîyan kenîya xecê ji serê min bînne der.
Dengê wî nizim bû,serê wî şor bû...
- Erê..Min neşîya xecê jibîr bikim.
Tilîlyên kenîya wê tijî nav wan dar mazîya bûn. Lirexê dî yê gelî deng vedida. Dengê girîya kiçên wî,kenîya wan,yaryên wan.Bişkurîna herdû kuran.Kenî û çivêlyên wan.Wek fîlmekî,lipêş çava kardikir.
- Erê..Min neşîya xecê jibîr bikim.Min neşîya biçûkên xu jibîr bikim.
Min neşîya xu jimal dûr bikim.Ez pêtivî mala xu bûm.Ez pêtivî jinekê bûm.Ez pêtivî xecê bûm. Min divîya biçûkên xu bibînim.Min divîya digel wan rûnim,digel wan baxivim.Min divîya bêhin kime xuha leşê wan.Min divîya bizanim ka çi dikit?Çi dixûn?Çewa dijîn?Digel kê digerin?

Min divîya paşeroja wan bizanim.Min divîya biçûkên min ji yên dunîyayê hemûyê baştir bin.
Serê wî giran bû,şor bû nav mila.
Axînkek rahêla.Vê carê herdû çavên şîn, ketine tura xemên wî yên giran.Lez liqelemî kir. da êş û janên wî liser kaxeza sipî bidestên xu yên nazik kum kite ber sînkê wî yê tijî kuvan.
Dengê kaxezê tijî kun ü qulaçên mejyê wî bûn. Çirîsk ji sersimên qelemî dipeşîn.
Serê xu bilind kir,hêşta xudana pirça zer û çavên şîn.Ya qamçîya liteniştên qelemê şemboz didit.
Zanî ya wasitîyaye,xemên wî,rengê rûyên wê jî yên zer kirîn.
Perdaxa avê bilind kire ber çavên xu,çavên wê pitir nêzîkî wî bûn.Divîya lêvên wê yên rengê hingivînî bibînit.Jiber pirça wê ya belav, çu xoşî jê nedît.
Dû qorç lavê dan,dengek bilind jigewrîya wî ya hişik hat.Pişta destê xu didevê xu husî.
Vê carê ew lihîvîya xudana çava ma..
Qelem dirêj bû nîva kaxezê,ew tilên nazikên ji givaştina qelemî sor bûyin.Bezîne bejna perdaxa avê û bilind kire wan lêvên nazig.
Lêv ter bûn.Çavzlkanê dest pê kir.Jor bê deng bû.
Berî xew lidlê wî bibite mêvan,til bezîne qelemî,deng jikaxeza hat.
- Roj bû rojê ez jimal dûr ketim.Peywendîya min bibiçûkên min nema.
Min rengê wan jibîr kir.Ez gelek tengav bûm, ez nesax bûm,min neşîya xu xudan kim.
Berê xu da wê xaça bidîwarê jorêve.
Xwîn ya jibirînên îsa pêxember dizêt.Kes derman nakit.Kes bû nagirît.Kes derdê wî nizanit.Hemû pesna mêranî û bêhin firehîya wî dikin.Hemû wek mînak bû jîyana xu didanin. Kesê nevêt bibite îsa yê xaçkirî.Hemûya divên bibine îsayê pêxember.
- Min birîyar da bizifirme mal...
Jor bê deng bû.Tinê deng jididanên qelmî dihat!
- Erê...Min birîyarda bizifirme mal.Bila kes pîte bimin nekit,bila ez bermayîka biçûkên xu bixûm.Bila ez lijora mêvana binivim.Bila wek seyekî serederyê digel min bikin...!
Çavên xu neqandin,divîya binivit.
- Ez çû me mal...
Ma lihîvîya xudana pirçê,zanî hest biderdê wî ne kir.
- Xecê dergeh vekir.Navçavên wê bûne girê!

Enîya xudana çava jî bû girê.Hest birwîdaneka mezin kir.
- Ez çûme jor.Avek û kupek çayê bû min înan. Min hizir kir,dilê dutmama min bimin sot.Dê ji min razî bit,dê limin burt.Dê bêjite min tû bû na êye mala xu?Tû bû na êye nav biçûkên xû?
Tilên xu têk husîn.Pirça xu biwan tila şe kirin.
- Piştî demekî kêm.Hêşta min ça xu venexwarî. Hêşta lêvên min ji ava wê diterbûn.
Dû polîsa hildane jor.
Xudana pirçê serê xu bilind kir.Dengê zincîra ji gulaliyên wê hat.
- Min zanî polîs bihayê wê ça û wê perdaxa avê bûn.
Xecê hemû tişt amade kiribûn.Polîs agadar kiribûn.Pîtivî çu suhbet û berevanîya nebû.
Êkser kaxezeka amade,danane ber sîngê min û liser min sepandin.ez xecê berdim.
Çavên wî ketine çavên wê yên şîn.Hest bidil pêvebûna wê nekir.
- çu jimin nehat.Min neşîya xecê razî kim.Ez necar bûm.Min xecê berda!
Jor ker bû.Qelem bibê dengî liser kaxezê kardikir.Kaxez bû avirmuş dibin didanên qelemî ve.
- Erê...Min xecê berda!Min liser birîyara mirina xu îmza kir.Min îmza kir ez nêzîkî mala xecê nebim.ez nêzîkî biçûkên wê nebim.ez mayê xu dijîyana wan da nekim...
Serê xu bilind kir,çu gihurîn ne ketîye dêmê xudana pirçê.
Xudana pirçê,wek pilingeka mê bidûv xezaleka küvî dibezit.
Her çendekê awirîyekê diditê û bilez dizifirte nêçîra xu.
- Dibit livî welatî,dinav xelkê vî welatî da berdan tiştekê asayî bit?!Dibit rewşit û tîtalên xelkê van welatan.berdanê bikêmasî nezanin?!
Em dibêjin..Hevit cara ya revandî be,neku carekê ya berdayî be...
Berdan..Anku mirin!Mirin gelek jiberdanê bû min baştire.
Peyva mirinê serê xudana çava jinav wê pirça zer û wan kaxezên belav îna der. Bêhinvedanek da til û qelemê xu.
Çav her man wek sîxorekê wefadar,li enîya wî ya girê û çavên wî yên wasitîyay!
Neşîyan xu liber stêrka çavên wê bigirt.
- Xecê hemû tiştên min bû.Xecê jin û heval û dayik û bira û kiç û kur... Û ü Dengê giryê jigewirîya wî derket.
- Berdana wê,birîyara mirina min bû.Dawiya jîyana min bû.Min jîyan nema. Ez dê jibû çi jîm?Dê bû kê jîm?Ez lihîvîya çi me?

Kesê persiva min neda?
Polîsekî milê min girt.Ez birime derê.Got eve nav ü nîşanên cihekî taybetin,xwarin ü nivistin bibê beranberin.Tû dişyê lê bijî heta tû bû xu cihekî baştir bibînî.Tû ü ev male ü ev biçûke ü ev jine jêk xilas.Nabit tû mayê xu dijîyana wanda bikî.
Heker tû neyê razî,tû dişêy birêya parêzerekî dawayê lidadgehê tumarbkî.Dadgeh dê birîyarê liser dit.Heta wî demî,xu jivî cihî û vê malê dûr bêxe!
Raste ew demekê dirêj bû min peywendî digel xecê nemabûn!
Raste ew demekê dirêj bû min biçûkên xe nedîtibûn!
Raste ez dijîyana wanda nemabûm!Raste ez wek mêvan limala xu da dijîyam!
Raste min çi kartêkirin û biha limala xu nema bû.
Lê...Berdana xecê.Û dûr kirina min bizurî ji mala min.Ez hêr kirim.Ez jidil ü gîyan hejandim. Ez ketim beranberî rastîyeka dijwar!
Bê xudan û rûreş.Dîsan Mame bitinê.Min hest bixerîbîyeka dijwar kir.Ez bûme benîştê devê hevala berî nehezan.
Her weku ez wê rojê hatîme vî welatî.Ketime kempeka bê seruber.Mêvanên wê hemû nîve mirov û nesax û xudan karesat bûn.Hemû dibê xudan bûn!
Min hest kir ez ne yê bitinê me.Gelek ji min xiraptir hene!
Ez ketime dijoreka biçûkda digel pîremêrekê nesax.Derdudermanên wî araq û dermanên bêhoşyê bûn.Şev ü roja ageh jixu nebû. Nedizanî ka çi dixut?Likîve dinivit,likîve dimîzit?!
Xwarin û nivîstin û mîztin û hemû tiştên wî liser textê wî bû.Bêhna mirarî ji cihê wî dihat.
Her ji roja êkê ez ketîme wê jorê digel wî pîremêrî.Min birîyarda xu asê bikim.Wek wî pîremêrî lixu nekim.Nekevme bin pîya,bû kesê ne bime bela.
Her wê êvarê min cigare hêlan.
Min vexwarinên dijwar hêlan.Min daxwaza dixiturekî taybet kir û dest biçareseryê kir.
Her zû ez hatime ser hişên xu.Ez likarekî gerîyam,min jidil vîya kar bikim..
Berê xu da xudana çava,divîya sund bixot ev axivtine dirastin!
Xudana çava şerê wê û qelem û kaxezê yê dijwar bû.
- Ez dirêj nakim.Min xu guhart.Ez bûme mirovekê dî.Ez bû me xudan kar û heval û pare..
Hevala gelek harî min kirin.Ez dibirme karên bisanahî û sivik.
Jîyana min gelek xoş bû.Min joreka biçûk bû xu girt.Ez Mam bitinê,ez azad bûm.Bidilê xu ketim.

Parêt min dikêm bûn.Lê têra min dikirin. Taybet piştî min cigare û hemû vexwarinên  kihulî hêlayin.
Ez ketime ser karekî bisanahî.Belav kirina rêkilam û rojnaman.Ü bişev digel hindek hevala diçûme karê paqijkirina xwaringehekê. Min demê xu bisanahî dibûrand.Ez tena bûm.
Çavên xu neqandin.Nevîya kes rastîya awirên wî bizanit..
- Min xecê û bîrhatinên wê jibîrkirin.Min dinîya û xemên wê jibîr kirin.Min ageh jikesê nema.
Ez bû roja xu jîyam.
Serê wî giran bû,çavên xu perxandin.Xew tijî bîbilkên çavên wî bû.Bawşek jinîva gewirîya wî deriket.
Xudana pirçê,qelem dana ser kaxeza.Destê xu havête perdaxa avê.
Bîra wî jî îna,wî jî perdax bilind kire ser devê xu, dengê gewirîya wî tijî jor bû.
Zanî gotinên xecê dirast bûn.
- Tû dilê mirovî ji avê reş dikî..Tû xu nizanî avê jî wek mirova vexûy!Dê kengî bîye mirov...?
Perdaxa vala dana ser mêzê.Berî simbêlên xu zoha kit.Dû polîs hatine hindav serî,milên wî girtin,kelamçe kirine zenda.
Bikenîka zer,xatira xu ji xudan pirça zer xwast.
Kelek pê nexoş dibû.gelek pê diherşî.Dema lipêş wan çavên şîn.Kelamçe dikine zendên wî yên berevanî bê ji welatekî dikir.
Gelek dergeh lipşt hatine girtin.Digelek kun ü qolaçan ra birin.
Liser cihê xu yê sar.Kete ser piştê.Çavên wî mane hilawîstî bibanê wê jora biçûk ü tarî ve.
Heval baş dizanin,nihu bersiva çu pirsîyara nadit.Silav nakite kesê.Divêt bû demekê dirêj digel xu bimînit,digel gîyanê xu aşit bibit.
Ew bixu dê ête nav wan,dê birisî bit,dê têhinî bit,dê wastyêt.Dê hemû nihênyên xu kete ser berka wan...
Xew har bû,leşê wastîyay dagîr kir.Xirxira wî tijî jor bû...

4 –

Gondîya,digel çend hevalên wî yên şoreşê. Yê kirîne dinîva xuda.
Mela û muxtar û dû şahid yên lihndav serî.
Milê wî girtin jinav hevala birine derê.
Çend ayat û pistpst jidevê Melay derketin.

Hemûya pêk ve destên xu bilind kirin.
Fatîhe liser wê birîyarê xwandin.
Tilîlî ji dû sê gewiryên nesax derket...
Ne dehol û zirna.û ne stiranbêj û mezîkin.
Dest qotan,ji hindek destên jiber merbêr û karê xunelukî bûyin dihat.digel hindek peyvên filiklorî ji gewiryên nêr derdiketin...
Hemû bilez bûn.Xwarin gîro bû.Ew mêvanên nîveka jyê xo birsî bûrandîn.Ketine ser kelexê wî beranê xalê wî ser jê kirî û diqazaneka mezinda baş kelandî...
Ew yê bilez bû.Bejna bilind,çavên reş,pirça dirêj libenda wî bû.
Mêvan dipirsî bûn.Binê amanan alîstin.
Ew yê bilez bû.Xecê ditirsîya.
Mêvana daxwaza çayê kirin...
Ew yê bilez bû.Xecê ya bilez bû.
Pîremêrekî bê kar.Çîroka xanê lep zêrîn vedigêra...
Ça vexwarin.
Ew yê bilez bû.Xecê lihîvîya wî şir bû.
Jor tijî dükêla cigarên tûtinê bû.Tijî keliştên dîwaran,mêranî û direw bûn.
Xew jigondî dûr ket.
Ew yê bilez bû,xecê wastîya.
Mêvanên bêkar.daxwaza kûz ü mêwîjan kirin.
Wî pîremêrê dû geza jigondî wêve ne dîtî. Çîrokên mêranyên xu vedigêran.
Ew yê bilez bû.Xecê bê hîvî bû.
Kesê nedivîya biçite mala xu ya sar.Kesê nedivîya wê dîwana têr û wê sohbeta xoş jidest bidit.
Şevên hosa her çend salan carekê dihelkevin. Kes xu gorî zavay nakit.Kes xoşîya xu nadite bixoşîya zavay.Dibit ev şeve dûbare nebit? Dibit eve xoşîya dawiyê bit.Hemûya xu şir kirin.
Gond ker bû.Biçûk ü nesax wastîyan.Xewê leşê wan dagîrkir.
Pîremêr û aşiqan dane berêk.Mêvana xew jibîr kirin.Eve jidespêka şoreşê ew têr ne nivisitîne, ew û xew nehevalin.Wan xew ya jibîr kirîn.
Ew tengav bû,dilê xecê yê jar bû êxsîrê xewê.
Kesê ageh ji agirê dilê wî nema.
Ça dubare vexwarin.Goz xilas bûn.Mêwîj neman.Çîrok û serhatî hatine vecûn.
Dîklê gondî jiber pişîkekê revî ser lêva govekê. Libnê dinîyayê ronahîyek dît.Perêt xu dane bay û bidengekê bilind bang da...

Cilvek bimêvana ket.Muxtar jinav hizir ü xewa hişîyar kir. Devê xu bire bin gohê birazavay.
- Biburin.Divêt zava biçite ser cihê xu...
Milên wî girtin.Herweku dê revit.Birazavay devê xu bire bin gohê wî,pistpstek bû kir,kete pêşîya wan.Beref wê jora biçûk ya ji axê û çilî dirost kirî birin.
Sersipî jixew hişîyar kirin.Xecê jinav tirs û hizra rizgar kirin.
Navê xudê îna,lipşt xu dergehê tenekê girt. Xecê jipêşve rabû.Pirça wê,wek ebayekê reş nîva bejna wê girtibû.
Ketine beranberî êk.Çavên wan gelek peyv gotin.Gelek bîrhatin liser dêmê wan hatine nexşandin.
Destên wê girtin.Kêşa nav sîngê xu.Dinav zendên xuda givaşt.Tijî mejyê wî bêhna xena pirça wê bû.
Dest da wê fanusa bidîwarîve hilawîstî,kêm kir. Jor tarî bû,xecê pişta xu dayê,rûyên wê dibin hîzarê ve ji şerma sor bûn.
Lipşt rawestîya,milên wê perxandin,hîzara wê rakir,lewendiyên wê vekirin.
Berî kuxka birazavay pête goha.Mirada xu bicih îna.
Ketine ser piştê,dû leşên rûs,yarî bitilên êk kirin.
Liser milê xu zivirî.Devê xu havête gerdena wê ya zirav,divîya bibite nava dû hinaran.
Dengê firokên sîxoyê jikuxika birazavay hat.
Karê xu kir.Divîya dergehî libirazavay vekit.
Dû polîs lihindav serî dirawestîyay bûn.
Milên wî girtin.Kelamçe kirine zenda ü birin...

5 –

Hêşta tijî çava xew bû,hêşta tijî difina bêhna xoha leşê xecê bû,hêşta tijî goha dengê mêvanên şivêdî bû.
Liser kursîka her car ronişt.Kelamçe jizenda vekirin.Dergeh lipşt girtin.
Lidûr xu zifirî,her weku eve cara êkê ye,wê jora mezin dibînit.
Çavên xu perxandin.Xew jê daqota.Dûsê qoriç liwê ava tezî dan.Zanî av gehişte binê gîjan rüvîkê.
Tezîyatîya avê,xew revand,hizirên wî cemandin.
Liser kursîkê,xu jêk kêşa,qirênî kete perasyên wî.

Dergehê biçûk vebû,xudana pirçê bidevekê tijî hîvî û bişkurîn,kete beranberî dêmê wî yê pêtî.
Ew kuma kaxez û ektên liber sînkê wê yê har. havêtine ser mêzê.Piştî roniştî,memkên wê hêdî hêdî zifirîn ser siroştê xu yê mê.
Gelek cara divîya bêjitê.Zehmetî wan memka nede.Ez dê êm harî te wan kaxez ü ekta hilgirim.Tinê bila karê te xudankirina wan memka bit.Çu karên dî neke.Lê ew ceger nebû.Ew jî bû kul ü ma didilî da.
Axîngên kursîkê dibin qonên wê yên xir da.
Jiwê zifirukê qortal kir.
Çavên wî man liçavên wê.Dû til likumputerî dan.Perdaxa avê bilind kire lêvên xu.
Zû zifirande cihê wê.Ekta hercar jinav kuma ekte ü kaxezan jê girt.
Ekte vekir,çend laper ladan.lichekî vala gerîya.Qelem jiçantê xu îna der,kire dinav sê tilên nazik da.
Bisedan pirsîyar jiçavên wê yên şîn libenda bersiva zîq man.....
Cihê xu xoş kir.Tilên wî bilivîneka tirsnuk,yarî bipirça wî ya şepirze kirin.
Tiva xu daura.Serê ezmanê xu yê ter,dilêvên xu yên hişik û zuha hosîn.Bêhna wî bizehmet biser diket.Dengekê şêlî ji gewirîya wî derket.
- Ez nizanim,ev suhbeta heta nihu min bûte kirî. tû çend bawer dikî?
Ez nizanim,ka te çi merem pê heye?
Ez nizanim,ev elmanîya ez dizanim têra te heye?
Ez nizanim,ka ez dişêm hemû xem û kuvanên xu bigehînme te?
Ez nizanim,te çi jimin divêt...?
Berê xu da navçavên wê.Ya mijûl bû binivêsînê ve.Pîte biaxivtinên wî nekirî ye.
- Lidestpêka van rûniştinên seyir.Te gûte min, min divêt harî te bikim.Jîyanê liber dilê te şirîn bikim....
Serê xu jinav kuma kaxezan înader.
- ü min gûte te.bihêle ez bimirim.Min harîkarîya te nevêt!
Şerê çavzlkanê dest pê kir.Bisedan muşek û bumbên jehrê dinavbera herçar çavan da peqîn.
Dem û gehên xav.Bûne berevan....
Zanî ya lihîvîya berdewambûna suhbeta wî.
- Ez bûme mirovekê asayî.Bûme xudan mal û kar û heval ü pare...
Min gelek jirabûrdwyê xu jibîr kir.Gelek jixemên min  bûne xewin.Barê min sivik bû.Min şîya binivim.Min şîya biçime nav xelkî da.

Lirojê diçûme karî,û bişev limal heval limin kum dibûn.Suhbet û yarî û car em pêk ve diçûne derê...
Deng jê nehat.Piştî qelem ji erkê giran xilas bûy.Ma lihîvîya devê wî. Bêdengyê peyama birîyareka dijwar gehand.
Serê xu şor kir.Dengê wî kêmtir dihat.Rengê wî pêtî bû.Lêvên wî dinav rîh û simbêla ra dilerizîn Çavên wî ji nînuka wî ya beranî ewa dinav tilên wî da yarîya pê dikit vene bûn.
- Hevalên min gelek hez jimin dikirin.Gelek qedrê min digirtin.Gelek barê min sivik dikirin. Biharîkarîya wan,ez bûme mirov.Hemû hewil didan,ez jîyaneka asayî bijîm.Divîyan ez hemû rabûrdûyê xu lipşt xu bihêlim.Ez bû evro bijîm....
Axînkek rahêla,dengê pêşemanyê tijî gohên wî bûn.
- Min jî divîya bibime mirovekê dî.Min jî divîya bijîm.Min jî divîya dinîyayê û xemên wê jibîr bikim.
Tila xu ya beranî bilind kire ber çavên xu. Her weku tiştek nû liser dîyar kirî.
- Rojekê,herdû nêzîktirîn hevalên min,ez mêvan kirim licihekî taybet.bibîrewerîya jidayikbûna min.Wek wan digotin!
Bişkurîneka xaf lêvên wî girtin.
- Herçende kes nizanit ez kengî jidayik bûyme! Ez bixû jî nizanim.
Serê xu bilind kir,pirça zer veda,dû çavên şîn û dêmekê befirîn dîyar bûn. Neşîya xu liber awrên wê yên tijî pirsîyar bigirt.
- Min gelek xu asê kir,lê digûtin ma tû jijina xerîb nebûy?Ma dilê te naçite dinîyayê?Ma tû nemêrî?
Xudana çava serê xu bilind kir,bidû çavên mê berê xu dayê...
- Min jin jibîr kirbûn.Min hemû jin weku xecê dihijmartin.
Dengek dijwar jikaxezê hat.Til bigerdena qelemî ve bûne xilfa werîsekê zifir....
- Min gote wan.Her tiştê hebit,ez razî me.Tinê jin ne bin.
Wan gotin,me cihek taybet yê dîtî.Kêm kes dizanin.
Sê çar jinkên ciwan û biçûk limaleka dûr jiçavan û kes digel me nabit,em hersê dê bitinê bin.Heta berê sipêdê em dê têr keyifa xu kin.Û tû evê carê mêvanê meyî.Lê tinê vê carê haa!
Carên bêt,herkes kurê babê xûye....
Ez neçar kirim,min jî divîya jibaznê ez têda derkevim.Min jî divîya jiwê jora biçûk derkevim Min jî divîya....
Xebata qelemî,ü nalîna kaxezê.Til yên sorkirîn. Çav yên dinav pirça har da xendqandîn!
- Her birêve,hevala birîyar dan,her êk jime biçite jorekê.Yara wî ya ciwan bit,ya kirêt bit, ya biçûk bit,ya reş bit ya sipî bit.Ew û bexê xu. Da dilê me jêk nemînit.

Xudana pirçê,çav lê zîq bûn,hizar pirsîyar ji dêmê wê peşîn ser mêzê!
- Liber dergehî,jineka sere,bidevekê tijî kenî û bişkurîn pêşiwazîya me kir.
Hevala ez dame nîyasîn.Gelek keyifa xu bimin îna.Em lijora mêvana rawestandin.Heval bilez bûn.Wan rêya xu dizanî.Hevalekî got,ez dî çime jora destê rastê!Yê dî jora destê çepê helbijart.Ez neçar bûn biçime jora nîvê.
Xudana malê destê min girt,ü ez beref jora nîvê birim ü got.Bextê te gelek yê başe, kiçeka ciwan û biçûk libenda te ye.Navê wê jîjî ye!
Lê hîvî ye,berî tû biçîye jor,xu livê serşoyê baş bişûy.Ü vê xawliyê dixu Bialîne û cilkên xu bike divê kenturê da.
Paqijî başe ma neweye?!
Ew dûsê roj bûn min xu ne şûştî.Piştî min baş xu şûştî,ew xawelî havête navtenga xu,ü rüs qesta jora nîvê kir.
Min dergeh vekir...
Hemû tişt rawestîyan.Neşîya baxivit.Tijî gewiryê dengê giryê bû.Kilmîşê wî rûn bû,firfir jidifnê hat.
Xudana pirçê biçavên tijî pirsîyar û hêbetî berê xudayê.
- Dibit tû dibêjî eve çi girî û rondikin?!Ma çi divê hemûyê daye heta tû hosa bigirî?!
Ma çi tiştê neasayî divê çîrokê da heye?!
Ew peyv jî nivêsîn.
- Min dergeh vekir.Kiçek nazik û biçûk ya rûse liser zikî.ya govarekî di xûnit.Pirça wê ya reş. nîveka pişta wê ya veşartî....
Min silav kir,byê limin bizifirt,bersivda.
Ew xawelîya navtenga min veşartî,min havêt. Ü rüs rûniştim ber tenişta wê.
Min yarî bikemaxên wê kirin.Bitilên xu pirça wê şe kir.Berî destê xu bihavême sîngê wê.
Min divîya dêmê wê bibînim.
Wek xezaleka küvî xu qolpande ser piştê.
Xu bû min amadekir....
Giryê ser ji axivtinê stand.Tijî nav rîhên wî ronidik bûn.
Xudana pirçê çavzlkanê digel kir.ma lihîvîya bersiva wê giryê ü wan rondikan?!
Gewirîya wî hişik bû,ew perdaxa avê neşîya gewirîya wî terbikit.
Dergeh vebû,tijî perdaxa wî av kirin.
Lêva hiçkê xu dibin difina xura îna ü bire çava. Kilmîş û rondik têkel kirin.
Qelem wek bazekê birsî,ma lihîvîya lêvên wî yên dilerizîn.
- Xu qolpande ser piştê!Çavên me ketin êk.
Ez bê hiş bûm.Çavên min tarî bûn.Min ageh ji xu nema.

Ez liqêryên wî bageh hatim.Dengê wê heta evro tijî serê min e.
- Babûû.....?!
- Jîyan......?!
Dergeh vebû,dû polîs digel dixiturek ü dû sistir hatine hindav serî.Milên wî girtin,dirêj kirine erdî.Dilê wî perxandin.Derzîyek lizenda wî dan. Danane ser textekê bitahêre ü dgel xu birin.....

6 –

Cih tarîye,germe,bê denge.
Ew oksicîna digehite difina wî,bêhna heşîş û tirîyakê jê difirt.
Leş yê wastîyaye,hizir dimirîne,hest nemaye. Ew derzîya berî çend demjmêra lizenda wî dayin.Gehên leşê wî yên xaf kirîn.Şanên mejyê wî yên nivandîn. Çend şanên şîm,jipaşîya mejyê wî hişîyar bûn. Digel hindekên jikartêkirina benca derzyê rizgar buyn vêk ketin.Gîyanê wî birine vîstevaleka evînyê.... Xudana pirça zer ü çavên şîn.bidevekê tijî kenî û bişkurîn,lihindav serî rawestîya.
Vê carê çu kaxez û ekte liber sînkê wê yê mê nebûn.Vê carê çu penteronên teng liber nebûn.Vê carê pirça xu biser kiras û vîstanên xecê da berda bûn.Vê carê ne ew jora hercar bû.Vê carê jorek bû dinavbera erd û esmanan da.
Jiber bejna wê ya zirav û bilind.Cilkên xecê bû dikurt bûn.Lê gelek jê dihatin. Neşîya xu,jipêşve rabû,divîya bikite dinav sîngê xuda,divîya bihelînte nav dilê xu,divîya bizanit eve çi xewne têda?
Berî her axivtin û pirsîyarekê jê bikit.wek nimayşkera cil ü bergan.Xu lipêş çavên wî yên birsî hejand.
Wek ektereka fîlmên sêksî.Liber sîngî rawestîya. cilkên xecê kitkte lipêş çava jiber xu kirin.Leşê xu yê zêrîn nîşa çavên wî yên har dan.
Êkser sêra çavên wî ketine bişkuşka memkên wê yên biçûk.
Hemû tişt jibîr kirin,gîyanê wî jikuratîya gehên pîr derket.Hest biçarde saliyê kir.Nêratîya wî harbû.Neşîya pitir xu bigirt.Bezî xudana pirçê. Da ber sîngê xu.dirêj kire ser wî textê nerm û paqij.
Divîya xu jî rüs bikit.Çu cilik liber xu nedîtin.
Nezanî çewa dê dest bizavatîya xu kit.Vîya ew Mirada didilî da bûye kul bicih bînit.Destê xu havête pirça jidavên rojê,da berdifna xu.
Tijî mejyê wî bêhna mêyatîya wê bû.

Devê xu havête lêva wê ya binî.Û jidil mêt.Têr nebû,devê xu jorda beref gerdenê bire xwarê.Dinîva memkên küvî husîn.Ezmanê wî kete ser wê xaça zîvî.Ewa zêrevanyê licoka memkên wê dikit!
Çavên xu neqandin,nevîya ev vîstevale bibite xewin.Destên xu dileşê nazik gêran.Neşîya nêartîya xu têr bikit.
Wek sê goşa bermoda.leşê wî kêşa dinav pêsîra xuda û givaşt.
Hest bihelîyana leşê xu kir.Hêşta destekê wî jipirça zer venebibû.
Hêşta şerê ezmanê wî û wê xaca zîvî bû.
Hest bi xuşîyeka dijwar kir.Dikuka xuşîya xuda, divîya çavên wê yên şîn bibînit.Divîya bizanit ka ew çavên mê çi dikin?Çewa berevanyê ji xu dikin?!
Çavên xu vekirin!
Jîyana kiça wî ya dinav destên wî da xav bûy....
Bihemû hêza xu,kire hewar.Wek dîn ü hara, rabû ser xu.
Jor ron bû,heval hatine hindav serî,hindek av berdane gewirîya wî ya hişik.....

- 7 –

Berî liser kursîka hercar rûnit.Berî kelamça ji zendên wî vekin.
Xudana pirçê libenda wî bû.Kaxez û ekte damade bûn.
Bibişkurîneka şirîn.silava sipêdê lê kir.Ma lihîvîya leşê wî yê xav û wastîyay.
Xew tijî bîbilkên çavên wî ye.Mejî yê wî hêşta yê şêlîye.
Cinabeta şivêdî liser xu ranekirîye.
Xudana pirçê,bitila beranî yarî biqelemê xu dikir.Lihîvîya lêvên wî yên veşartî bû.
Serê xu bilind kir.dêmê wê yê befirîn.Tijî hîvîye. Ew lêva şivêdî dinav lêvên xuda hêray,Ya tere. Ew pirça hêşta cihê davên wê dinav tilên wî da sor.ya tere.Xunavê bernedaye.vê sipêdê ya şuştî.Vê sipêdê cenabeta şivêdî ya liser xu rakirî.Ew pirça şivêdî dinav davên wî da xendqî,tijî nav rîh û simbêlên wî davên wê ne. Ew pirça bû wî bûye perstgeh,divêt her roj sipêdê tewav dikit.Vê carê,ew pirç ya bipatekê sor lipatka xu girêday.
Herwekû jiçavên wî yên sor vedişêrt.
Ew memkên nazik,ewên şivêdî dinav lêv û didanên wî da direvîn.Heta nîvê didîyarin. Qebê wî dixwazin.

Ew xaca şivêdî berevanî jicoka memkên wê dikir.Nihu îsa yê hilawîstî bibirînên xu yên xuneluve.wek biçûkekê şum.yarîya liser befirê dikit.Yê hulîsankê libetenên memkên wê dikit.
Herweku ne ew zêrevanê ser şorê şivêdî bû?!
Ew çavên şîn.Ewên diçirka xoşyê da,buyne pelên agirî.Nihu reş xûya dikin.Dikil dayine.Eve ne çavên wê ne.Eve çavên jîyana kiça wî ne.
Qelem rewî.Rewîna seyekê har jê hat.Kaxez livî.Dengê renîya befirê jê hat....
Hest kir,ya hzirên wî dixünit.Hest kir,yê rüse liser kursîkê.
- bibure,ez nizanim çi bêjim?Ez bawernakim bişêm bezmanê xu yê lawaz.te tê bigehînim?!
Serê xu şor kir.Xirxira qelemê liser kaxezê gohên wî simtin.
- Ez nizanim,çewa wê karesata hatîye serê min,bûte wêne kim?!Çewa bigehînmete?!
Dibit rüdanên hosa,gelek cara hatibine serê xelkên van welatan?!
Dibit ew rüdan liber te çîrokeka dubare ü sê bare ü deh bare bit?!
Lê bawerbike.Hindî dinîya heye,û hindî hebit, rüdaneka hosa liwelatê me dirust nebûye û dirust nabit....!
Serê xu şor kir.Destên xu havêtine gohên xu. Dengê kaxezê gohên wî disimtin.
- Ez neşêm bûte dîyar bikim jiber çi?Dibit dîn û rewşt,me jivan karesata diparêzin?!
Serê wî giran bû.Stuyê wî neşîya barê giran helgirt.Tijî devî bawşkên xewê bûn.
- Wê rûdanê jîyana min dûbare aluz kir.Ez hêr kirim.Ez har ü dîn kirim.Ez kirme mirovekê bê hiş ü mejî.Bê çav ü dil.
Min hest biçu tişta nedikir,min ageh jiçu denga nema.
Ez liqêryên kiça xu hişîyar bûm.
Dûsê zegzega milên min girtin.Ez birime derê. Ez rüs ü ew rüs.dinav wê kuma mirovan da. Hewarên wê diçûne beresmanan.Duwa milên wê jî girtin û birine cihekê nedîyar.
Ez Mam dinav distên wanda.Heta polîs hatîn.
Hêşta ez yê bê hiş bûm.Hêşta min nedizanî çi bûye?!Hêşta min bawer ne dikir!
Min neşîya çu bersiva bidim,min neşîya çu pirsîyara bikim!Min ne şîya baxivim....
Tinê min zanî min liser kaxezekê îmza kir.Wesa dîyar bû,min mav nîne mayê xu dikarê kiça xu bikim.Ew azade çi karê bikit û lici cihê hebit!

Ez ketime nav kulanên berlînê.Ez nizanim çend roj û çend şeva,ez wesa bê hiş Mam.
Ez nizanim çewa dinivistim?Min çi dixwar? Likîve dijîyam?!
Ew hevalên digel min.Gelek pirsîyara min dikirin.Cihê min zanîn.Ez birime nik xu.Piştî demekê dirêj,min ageh jixu bû,lê ew karesat, wek xewinekê dihate pêş çavên min.Min bawer nedikir.Min nedivîya bawer bikim. Birînên min pêtivî demekê dirêj bûn.
ez diberzebûneka dijwarda dijîyam.Ew rûdan dibûne xewin,dibûne kabûs.Şevên min dişêlandin.Min nivistin nema.Min xwarin nema. Min kar nema.Min heval neman.Heta min baş ageh jixu bûy.Rûdan bû min dîyar bû.
Ez necar bûm wek rastîyeka jîyana xu wer bigirim.
Ez ketim beranberî rastîyeka tal.
Serşorî û razî bûn biher tiştê xecê û kiçên wê dikin.Û her axivtin û gotgotkên xelkî?!Yan xu kuştin....!
Xudana pirçê,serê xu bilind kir.Dû til dane bin wan davên pirça xu,jiber çavê xu yê rastê ladan,havêtine pişta gohê xu.Hizar pirsîyar ji awiryên wê dipeşîn.
Wek bersivdaneka bilez bû wan hizar pirsîyaran.
- Jiber min pê çê nabit xecê ü kçên wê bikujim.Divêt xu bikujim?!
Erê....Min ev birîyare da,piştî gelek hizir kirinê,ü gelek ligîyanê xu gerîyayim.
Min birîyar da xu bikujim!
Ew davên pirça wê dîsan kitkite hatibûne hindav çavê wê.Vê carê bibinê qelemî ladan. Awirîyek dayê û bilez zifirî karê xu.
- Lê çewa xubkjim?!Kengî û likîve?!Bi çi amîr?
Çend pirsîyar bûn.Bersiva wan linik min nebû. Ez dinav wan pirsîyaran da berze bûm.Min xu jibîr kir.Min dinîya hemû jibîr kir.
Dengê wî gelek nizim bû,xudana pirçê destê xu dida bergohê xu heta baş goh likazndên wî bibit.
- Carekadî,serê min û dilê min bûne gorepana xemên xecê û kiçên wê.Carekadî,ez neçar bûm,bibim beşek ji şaşî û jîyana wan.
Ew dengê nizim jî çik bû.Wek peykerekê bê gîyan xûya dikir.Dû çavên zîq ketine wê pencera liberanberî sîngê wî.Gîyanê wî siwarî pêleka dijwara ronahyê bû.Ü derkete çîhana azadyê.
Wek xurtekê çarde salî,kulan û baxçên bajêrê berlînê têkvedan.
Tijî bersîngê xu dîyarî kirin.Her kurekê xu,hindek şirînahî û hindek yarî bû kirîn.
Dîyarîya xecê berî hemûyan dayê.wek gelek caran.
Kulunîyeka erzan bû,xecê bê razî nebû.

Dîyarîya evînê pêlaveka çimik bilind bû.Divîya dîyarîya jîyanê vekit.Serê xu bilind kir.Jîyan ya rüse.wek ektereka sêksî ya şareza,xu pêşkêş dikit.
Tiv kire gîyanê xu,û jiwê gerîyanê biser şorî zifirande nav destên xudana pirçê...
Serê xu bilind kir,dû çavên şîn.Biwî qelemê dil req,yên hemû hizir û livînên wî tumadkin.
Divîya leşê rüsê kiça xu jîyanê jipêş çavên xu nehêlit.
- Min vîya xecê bibînim!Min vîya hindek pirsîyara jê bikim!Min vîya bizanim ka ewê ageh jikiça xu heye çi kar dikit?!Min vîya bizanim ka ew jê razî ye yane?
Axînkek jikuratîya gîyanê wî derket.Bêhna xwînê jê hat....
- Tinê min divîya bersiva van pirsîyaran bidit!
Bidengekê nizmtir.Serê xu şorkir,xu binünukên xuve mijûl kir.
- Xecê berzebû.Xu limin veşart.Min berlîn hemû têkveda.Min elmanîya hemû têkveda.
Bitila beranî û ya şehdê.Yarî bisimbêlên xu kirin Herweku bêhnivedanekê didite xu û xudana pirçê...
- Min xecê nedît.Ez bê hîvî bûm.Ez wastîyam. Ez nesax bûm.
Heta rojekê hevalek hate nik min ü got:
Evro xecê telefuna min kir!
Ez rast rabûme serxu,min nehêla axivtina xu bidawî bînit.Min bersîngên wî girtin.Ü daxwaza cihê xecê jê kir...
Destê xu dana ser milê min ü got:
Raweste bira,date têbigehînim!
Ez sist kirim.Min bersîngên wî berdan ü mam lihîvîya devê wî.
Piştî rûniştî û bersîngên xu dirust kirîn,Got:
Evro xecê telefuna min kir ü got:
Bêje şêru bila bes lime bigert.
Heker lidüf serê xu biçit.Ez dişêm bisanahî wî berzekim.
Bila bela xu jime vekit.
Derbarey jîyanê,min agehî jê nîne ü ez jî jikarê wê nerazî me.Eve pitir jidûsale min jîyan nedîtî ye.Bila bela xu jime vekit da wek mirovan bijîn. Mane bese ew jiyê bişivanî me digel burandî?!
Van gotina çu aqil nehêla diserê minda.
Ez hêr kirim.Min kire hewar.Çu nemabû min ew heval xendqandî.
Min baş dizanî direwa dikit!Min baş dizanî ew gewada kiça xu jîyanê ye.
Ew bixu qehbeye.Ew bixu leş firuşe.....
Destê wî hevalî liser milê min,barê min sist kir.Ü got:

Wene bêje bira,her çewabit xecê jina te bû,û dayika biçûkên te ye û dutmamate ye û...
Axivtina xu birî.Min zanî divêt tiştekî dî bêjit!
Min pitir bêhna xu fireh kir ü gotê:
Bêje.Te divêt tiştekî bêjî?Neveşêre,min çu nemaye ez şerm jê bikim.Hema bêje?!
Piştî necar bûy, got:
Bibure kak şêru.Min nedivîya bêjim lê dê her zanî.
Xecî ya şo kirî....
Her weku muşekek biserê min ketî.Ez bê deng û bê hiş bûm.
Min nezanî ka piştî wê gotinê çi gotinên dî gotin?!Min nezanî çewa xatira xu jimin xwast? Ü ka kengî çu û ka çewa ez hêlam?!
Erê....Xecê şo kir.Jîyan bû qehbe....Evîn çu digel kabirayekê kes nizanit çi millet ü çi dîne....Welat yê bûye heşîş kêş liser cadên berlînê xazukyê dikit.Tinê Kawe rengê mirovan didit.Ew jî yê licihê bê xudanan dixûnit.
Paşeroja wî jî hêşta ya nedîyare...
Herweku bû xu daxivit.
- Erê...Xecê şo kir!Min nezanî şo bikê kir?!Çi kese?Çi millete? Çi dîne?
Ev pirsîyare mane diserê minda,wek kiluxkekê rizî tijî kirim.Mejyê min dixwarin....
Serê xu bilind kir da bizanit ka xudanê çava rondika bû dibarînit?Yan ew jî wek gelek heval û biraderên wî tirana pê dikit?!
Xudana çava yamjûl bû bikarê xuve.Ageh jiçu nebû.Hind digehişt,awirîyekê biditê da livîn û axivtinên wî bikite êk û liser kaxezê binexşînit.
Neçar bû,yadlê xu bû bêjit.
- Ew peyama xecê bû min digel wî hevalî hinartî,dilê min tena kir.
Raste min bawer nekir.Min nedivîya bawer bikim!Taybet piştî şo kirî.
Şo kirina wê ez jidil û gîyan hejandim.Şo kirina wê bû min karesat bû.Şo kirina wê,liberanberî leş firotina kiça wê bû.Ez hêr kirim.Min çu nema bû bijîm.Mirin bû min dîyarîyeka mezin bû!
Peyva mirinê jor bê deng kir.Qelem nivand, kaxeza destên xu bilind kirin.
Hizra xu dikon ü qolaçên tarî da veşartin.Mejî şir bû,leş xav bû.
Dergeh vebû,milên wî girtin.Jorda birine xwarê.....
Heval lihîvîya çîroka evro dironiştîbûn.
Her liderî.Perdaxeka çayê û çigarek danê.
Dûsê denga pêgive gotin:
- Ê...?!Dê bêje,ka te çi got? Ü te çi kir?

Xudanê perdaxa çayê û cigarê got:
- Jiserî heta te ev çaye û ew cigare jimin wergirtîn?!

- 8 –

Jor tarî bû,deng nema,livîn kêm bûn.
Ew pistpstên dihatin kirin,xewê xendqandin!
Dû çavên zîq,wek bînerê fîlmekê tirsê, temaşay dükêla cigara xu dikir.
Dükêla cigarê dibû bazin û bilind dibû,digel hizirên wî yên jengî yarî dikirin.Çend dükêl bilind dibû,çavên wî zîqtir dibûn.Heta pêkve bibinanê zîndanê diketin,dibûne bawişkên xewê û jorda binav çavên wî diketin.....
- Xecê şo kir....
Mejyê wî tijî tilîlyên kenîya xecê bûn!
Xecê jinav hindek kêrata derket.Lewendiyên xu yên havêtîne ser milên xu.Lêva kirasê xu ya kirîye diber duxwîna xura.
Menceloka şîrî ya dizendê da şor bûy.
Herçendekê,biserê dû tila perçema xu ji sêra çavên kilday didite paş.
Xu jibêrîvana vedizî.Lipşt reş mêweka tirî. Menceloka xu veşart.
Biçavên tijî kil,ma lihîvîya wî.
Çepek lixuda.Gopalê xu digîskeka şûm werand .Jiçavên bêrîvana dûr ket.
Qesta cihê jivanê hercar kir...
Lihndav serê xecê rawestîya.Çav lê zîq bûn. Reng lê zerbû.....
Xecê ya dinav destên zekzekeyekê reş û lêv doqçik da bûye şemamuk.
Destên wî yên req,yên memkên xecê diperxînin.Lêvên xu yên wermî,yên havêtîne lêvên xecê yên nazik.
Wek şemalika agir pêve,yadinav sîngê wî yê bihêzda dihelit.

Dest da gopalê xu bilind kire hindav serê yarê wê yê reş.Da xecê jibin kelexê wî yê dirinde bînteder.Lez kir da lêvên xecê jinav wan doqça qortal bikit,lez kir,da memkên xecê jinav wan til milhêba rizgar bikit.Lez kir, lez kir. Gopal bilind kir.Hêza xu cemand.Navê xudê îna.Gopal weşande serê wî......
Agirê cigara wî gehişte tilên wî.Til sotin.Hizir û xem û xew revîn.Rast rabû ser xu.Jor ya tarîye. bê denge.Hemû wek mirîya dinav kifnên sipîda diveşartîne....
- Xecê şo kir......
Recivkê leşê wî dagîr kir.Car tijî enîya wî xoh dibû. Car lê dibû ta sa.
Heta berê sipêdê ma hişîyar...

— 9 -

Berî deng jiseqata dergehê jora wî bêt,yê amadebû.Wek sofîyekê dîndar,berî Mela bangê sipêdê bidit,dûsê sinneta dikit.
Rêya hercar dizanî,berî wan polîsên bûyine hevalên wî gavên xu dihavêtin. Dergeh vekirin,qeyd vekirin.Gehên enîya wî venebûn.
Neşîya xu liser kursîka hercar bigirt.Tijî hinava ta sar bû,recifkê şer digel xewê dikir.Xew wek ewrên zivistanê jihndava serî nediçûn.Rengê pîstê wî zer kir.Çav lê sor kirin.
Çavên xu neqandin,divîya binivit.Xew weku biçûkekî şûm bela xu jê venedkir.Yarî bigehên dilê wî yên xav dikirin.
Berî xew,leşê wî yê wastîyay dagîr bikit. Xudana çavên şîn lihndav serî rawestîya. Qefteka kaxeza danane ser wê mêza dinavbera wanda.Dengê peqîna muşekekê jê hat.Muyên leşê wî zîq kirin.
Ekta hecar vekir.Çend kaxezek têkivedan, cihekî vala amadekir,qelem kire dinav tilên nazik da.Ma lihîvîya lêvên wî yên werimî...
Dû sê cara serê xu bilind kir,çavên wî ketine wan çavên şîn yên tijî jîyan. Nînukên xu dane ber didanên xu yên zer.
Tilên xu têk werbadan,perxandin,kirine tizbî. Pirça xu pê xurand,pê şe kirin.Carekadî kirine dinav pîsîra xuda.
Cihê xu xoş kir,deng jigewirîya xu îna.Çavên xu neqandin.Vekirin,perdaxa avê da ser devê xu. Cigarek berdayê,zû havêt.
Hemû berûykên xu têkvedan,qulpkên kirasê xu vekirin,girtin.
Ew tabloyên bidîwarî ve,diserê xuda şirove kirin.Rengê dîwaran û yê pencer û dergehan. Û ew gilupa bibanî ve ne bidilî bün.

Divîya mayê xu direngê lêvên wê û rengê çilkên wê jî da bikit.
Zenga telefunê çetên hizir û xewê revandin.
Ew çavên şîn ji çavên wî yên wastîyay û tijî xew û xem venebûn.
- Xecê şo kir...Jîyanê xu firot...Evîn bidûyiv evîneka vêlbaz ket,dawiya wê berzebûne... Welat yê bûye êxsîrê dermanka.Yê mirî ye, xuzîya mirina wî... Kawe...Kawe yê bûye kurê vî welatî.Me nanîyast,nizanit çi millete?Çi dîne? Peywendîya me roj bû rojê ya sist dibit.
Ez ditirsim ew jî berze bibit.
Herkesê lichê min bit.Her kesê ewa hatîye serê min,bête serê wî.
Dê çi kit?Dê çewa şêt jît?
Xudana pirçê serê xu bilind kir,hest kir ev pirsîyare jiwê hatin kirin!
Qelem havête ser kaxezê,bidû tila perçema xu jinav çavên xu lada.Neşîya bersiva wî bidit. Lêvên xu gezandin.Hest bigiranîya pirsîyaran kir.
Dû qorç liwê ava libersîngê xu dan.Wek bêhnivedanekê da xu û wî.
Her zû lêve bû.Zanî heker bêhnivedana wan dirêj bit.Hevalê wê dê liser kursîka xu nivit.
Kaxez lêkdan.Binê wan dûsê cara libanê mêzê dan.Dengekê dijwar jê hat. Dest da qelemî,çavzlkanê digel çavên wî yên têrxew nebûyîn kirin.
Lêvên wî yên dinav rîh û simbêla ve xendqîn. Berevanîyeka bê omêd dikirin.
- Ez nizanim çi bûte bêjim?!Ez nizanim min çi kir?Min çewa jîyana xu dibûrand?
Ez çewa dinivistim?Çi dixwar?Likîve dijîyam?!
Serê xu şor kir.bê deng bû,tilên wî ketine şerê xu kujyê.Divîya erd şeq bibit kelexê wî yê genî daurit.
Çavên wê yên zîq,bêhna wî teng kir.neşîya serê xu bilind kit.Neşîya bêhna xu hilkêşt. Tengav bû,zanî qortal bûna wî tinê bigotina rastîya rudanê ye.
Dûsê qorç ligewirîya xu ya hişik dan.Awazên giryê digel tifa wî ya tîr çûne xwarê.
- Rojekê....Bibure,ez neşîm bîjim...Min nevêt bêjim!
Destê xu havête perdaxa avê.Jireciva leşê wî, perdax nîvî bû.Ew ava may neşîya gewirîya wî ter kit.
Dergeh vebû,perdaxeka tijî av danane ber sîngî.Ewjî vala kir.
Serê xu bilind kir,qelem yê libenda lêvên wî...
- Rojekê min ageh jixu bû.Ez yê liber dîwarê westgeha berlînê ya serekî.
Tijî rex ü dûrên min kelexên nîv mirîne.
Wesa dîyar bû,çend dermankêşên berlînê lêk kum bibûn.
Ez nizanim,em çewa û jibûçi wesa lêk kum bibûn?!

Bûmin ew ne giring bû!
Min divîya bizûtirîn dem jiwî cihî dûr kevim,ez lixu zivirîm min...
Giryê ser ji axivtinê stand.
- Liber tenişta min....Ka ew çend roje...Birex minive...
Girî biser ket,neşîya baxivit.Tijî difina kilmîş bû. Bilêva hiçkê xu ronidik û kilmîş têkel kirin.
- Kurê min,welat yê birex minive nivîsitîye.
Ageh jidinîyayê nîne.Dermanka leşê wî yê sotî.
Dema min kurê xu welat wesa dîtî.Agir berbî dilê min.Min jidil kire hewar.Ew demekê dirêj bû ez jê bêhîvî bibûm.Min bawer nedikir dê bînim.
Min hemû azar û xemên xu jibîr kirin. Kartêkirina wan dermana liser min nema.Min kurê xu welat da ber sîngê xu ü jdil kire girî.
Bê deng bû,herweku divîya bizanit ka xudana pirçê bawer jê dikit?Yan ew jî yarîya bihestê wî dikit?!
- Lidestpêkê kurê min welati ez nenîyasîm!Niza jiber katêkirina wan dermanik vexwarinên kiholî bûn?Yan ew demekê dirêj bû ez nedîtîm?
Min destê wî girt û jiwî cihî dûr kir.Min têr da bersîngê xu.Têr macî kir.Têr bêhna wî hilkêşa.
Em bûne pêtirankên xelkî.lê çu tişt bû min ne xem bûn.
Min kurê xu dît!Ez dê wî kime mirov.Dê wî ji xecê parêzim...
Nuke tû dibêjî.Tû bixu ne mirovî!Tû liser cade ü nav baxça dinivî!
Raste!Ez nemirov bûm.Lê piştî min welat dîtî, dê bime mirov.Dê jiber xatira wî hemû tişta kim.Dê kar kim,da ew bijît,bixûnit.Dê xu birisî kim,da ew têr bixut.Dê xu gorî wî kim....
Firek liwê ava dibinê perdaxê da may da. Dengê fira wî tijî jorê bû.
- Min qesta hevalekî kir.Min xu havête nav mala wî.Min çîroka xu bû got.
Wî çîroka me baş dizanî.
Mala xu bû me vekir,gelek har me kir.Em çend rojeka man linav mala wî.
Heta em hatîne ser hişên xu.Me peywendî bihndek destgeha kir.Em hinartine dixiturekî taybet.
Dixiturî birîyar da me lixestê binivînit.
Çîrok dirêje.Em gelek lixestê man.Ez berî welati derketim.Ez hinartme kempekê,ez bûme xudan cih.Joreka biçûk likepeka bêxudana digel pîremêre kê nesax.
Her roj diçûme xestê linik kurê xu welatî.Û bişev dihatime jora xu likempê.

Bêhna min fireh bû.min hest bitama jîyanê kir. Divêt ez bijîm.Divêt ez karbikim.Divêt ez welatî bêxime ser rêya dirûst.Divêt welat wek min bijît.Wek xelkê welatê me!Divêt welat bû xu bibite wec.
Hişên min hatine serê min.Ewa hatî ye serê min,hemû wek fîlmekî dihate pêş çavên min.
Min birîyar da ez bijîm.
Erê min jidil birîyar da bijîm.Ne jibû jîyanê!
Min birîyar da ez bijîm da carekadî li xecê bigerm.
Xudana pirçê serê xu bilind kir.Dengê şivtana jigolaliyên wê hatin.
Çirîsk ji çavên wê yên şîn peşîn!
- Min gelek pirsîyar kirin.Ez gelek gerîyam.Min divîya xecê bibînim.Min divîya bizanim ka jîyan likîveye?!Ka çi dikit?!Ka ew kar hêlaye yan ne?!Min divîya bizanim ka evîn likîve ye? Çidikit?Çewa dijît?
Hemû limin berze bûn.Tinê min şîya xu bigehînme kurê xu yê dî Kaweî.Min cihê wî zanî,ez çû me nik berpirsa wî cihî.min gelek hîvî jê kirin.Min suhbeta xu bû got.
Tinê razî bû ez jidûr bibînim.Ü got divêt ez digel polîsa baxivim.Û divêt ew jî razî bibit te bibînit.
Piştî çend rojeka,polîs hatine kemipa min. Wesa dîyar bû,pirsîyara min kiribûn û berpirsên kemipê bibaşî ez dabûme nîyasîn.Lewa her zû izina min dan ez kurê xu Kawey bibînim...
Dêmê wî geş bû,lerzika lêvên wî sist bû.
- Min karê xu kir,ü dgel dixiturê welatî axivtim. Da wî jî digel xu bibime seredana birayê wî.
Gelek keyiva dixiturê welatî hat.Got eve beşeke ji çareseryê.
Wek tû baş dizanî.Piştî xecê şû kirî,û ez biserê xu ketîm.Biçûkên me her êk birexekî ve çû bû. Kawe licihê bêxudana akincî bibû.
Piştî gelek pirsîyara û lidüv cuna,piştî min gelek kaxez îmza kirîn.Piştî min bersiva gelek pirsîyaran day.
Hêlan em biçine jor.
Bê deng bû,çav lê zîq bûn.Her weku likawey digerit.Jor biçavên xu ser ü bin kir.
- Lijoreka taybet Kawe lihîvîya me bû.
Min dergeh vekir,çavên wî bime ketin,tijî çava rondik bûn.Min neşîya xu liser pîya bigirim.
Ez ketim ser kursîyeka nêzîkî dergehî....
Giryê ser ji axivtina wî stand.

- Herdû bira ketine beranberî êk!
Wek dû peykeran hişik rawestîyan.Hêbetî ü mendehoş bûn.Nezanîn dê çi bêjine êk? Nezanîn silav kine êk.Nezanîn pirsîyara halê êk bikin.
Ew perpirsa digel me hatîye jor û gelek harî me kirî.
Gote Kawey,eve babê te ye.Û eve birayê te ye.
Silav bike wan.Yên hatîn te bibînin.
Te gelek cara pirsîyara wan dikir.Mate ne vêt wan bibînî?!
Kawe bê hiş bibû.Çu livîn jê ne dihatin.
Min neşîya jicihê xu rabim.Min destên xu vekirin ü got.
Were Kawe,were bersîngê babê xu.Were ez babê teme...
Giryê cihê axivtinê girt.
- Wî ez dinîyasîm.Lê bawer nedikir.
Mendehoş bibû. Nedizanî çi bikit başe.
Berpirsa wî carekadî gotê.
Kawe,ew babê te ye.Here nik.
Kawey kire xar û qesta sîngê min kir.
Min ew givaşt.Wî ez givaştim.
Min tijî mejyê xu bêhna leşê wî kir.Min têr kire girî.Em gelek wesa man.Me welat jibîr kir. Welat bibû wênegirekê şareza.Hemû livîn û rondikên me tumar dikirin.
Berpirsa Kawey,milê wî girt havête nav kuma me.Em hersê bûne êk peyker...
Ew jina digel me hatî ye jor.Dûsê caran çavên xu zilqotandin,tijî çava rondik bibûn.
Em hêlan bitinê ü derket.
Gewirîya wî hişik bû,girî û recivik têkel bûn.
- Bibure,ez neşêm baxivtinê rewşa wê roydanê bikim.Ez neşêm wan çend demjmêra biçend gotineka şirove bikim.Tinê ez dibêjim.
ew xoştirîn çirke bûn dijîyana min da.
Xudana pirçê perçema xu lada,stêrka çavên şîn êxistine lêvên wî yên lerzuk.
- Eve dû kurên min dîyar bûn.Eve nîveka mala min kum bû.Dibit em bizifirine jîyana xu ya berê!
Dengê wî nizim bû,wek pîremêrekê nesax çîroka bû nevyên xu dibêjit.
- Min ser jiwan berneda.Biharîkarîya rêxiraweka mirovayetî.Me şîya welatî jî liwî cihê Kawe lê dijît.akincî bikin.
Çareser kirin û çavdêrî û xwandin û jiyana wan kete wê mala bêxodanan.
Herçend rojan ez diçûme seredana wan.

Em bûne parçek,peywendyên me mikum bûn Ez pitir tena bûm,xemên min sist bûn.
Min karê xu kire gerîyan.Gerîyan lixecê û kiçên wê.
Xudana çava hest biwastîyana wî kir.
Divîya bêhnivedanekê biditê.
Wî nevîya rawestit,hest dikir biwê rawestanê dê şon pên xecê û kiçên wê berzekit.
- Min daxwaz jihindek hevalan kir harî min bikin.
Ew dimekê dirêj bû min zanî evîn ya hatîye berdan jimêrî xu.
Hinda digotin,ya gehştîye dayika xwe. Hinda digotin ya gehiştî ye xüşika xu jîyanê û digel wê kar dikit....
Van gotina ez hêr kirim.Ez dîn kirim.Çavên min tarî kirin.Rê liber min berze kirin.
Sêra çavên wî kete kuma kaxezan.Jîyana wî, bixoşî ü nexoşî ve,yên dinav van kaxeza tumar kirîn.Hemû axivtin û livînên wî.Hemû xewin û hîvyên wî.
Ev kuma kaxezan.Hemû jîyana wî ye.
- Min gelek xu wastand,ez gelek gerîyam,min pirsîyara gelek kesan kir.Min daxwaza harîkarîya gelek kesan kir.
Tinê min divîya tiştekî ji jîyan û evînê bizanim! Tinê min divîya bizanim ka evîn jî gehiştîye jîyanî?!Ew jî ketîye tora wê?!Ewê jî ew rê helbjatî ye?Yan ewa min goh lê bûy hemû direwin?!
Xudana çava bêhnivedanek da qelemî.
Tilên xu perxandin,firek liwê ava liber sîngê xu da.Bilez qelem kire dinav tilên xuda.Her weku dê qelem revit.Ma lihîvîya lêvên wî yên hişik.
- Min cihê xecê zanî.....
Xudana pirçê serê xu bilind kir.Çav lê zîq bûn. Ma lihîvîya wî ka dê çi lixecê kit?Dê bi çi çek xecê kujit?!
Jor bê deng bû,qelem ma lihindav kaxezê.
Serê xu bilind kir,zanî tiştek got,kartêkirineka dijwar liser livîna qelemî kir!
Peşêman bû,lê neşîya ji gotinên xu lêve bit.
Çavên xu êxistine çavên wê,da bizanit ka kartêkirina gotinên wî çende liser hestê wê?!
- Nav ü nîşanên wê,cihê karê wê,heval û dustên wê.
Hemû bu min xûya bûn.
Min hemû tişt jê zanîn!Heta rojê çend cigara dikêşt!
Çavên xudana pirçê zîq bûn.Dêmê wê sor bû. Çavzlkanê digel çavên wî yên tijî serketin dikirin.

Ma lihîvîya destê wî,haha xencerek, demancek dê bilind bite bejna xecê....
- Pitir ji heyivekê ez wek sîbera xecê lidûyiv çûm!Pêngav bipêngav.
Çi dixwar.Digel kê di axivit.Çend maç bilêvên wê diketin.Çend dest diçûne paxlên wê!Min hemû biçavên xu tumar kirin.
Serê xo şor kir.Cih şir bû.Yarî binînûkên xu kirin.
Çu nemabû,xudana pirçê birîyara bêhnivedaneka dirêj bidit.
- Rojekê,xecê jimal derket.
Kilîla dergehî dana bin wê pirta mehfîra liber derazînkê!
Piştê ew dûr ketî.min kilîl îna û ez çûme jor.
Mala wê ya lêkday û xoş bû.Wesa dîyar bû ne bitinê dijîya.kesek yan hindek kes digel dijîyan. Ez gelek gerîyam,min çu şûn warên jîyan û evînê ne dîtin!
Bêna min teng bû,min hest kir,haha zirtekek dê ête jor,min dite ber xenceran.
Ez derketim û liberanberî mala xecê rawestîyam.Mam lihîvîya wî kesê xecê kilîl bû veşartî.....
Lidur xu zifirî,divîya bizanit ka kesê dî goh lê nîne?!
Dengê xu nizim kir.Xudana çava, bêhna xu çik kir heta goh lê dibû!
- Piştî demekê dirêj.Êvareka direng.
Serê xu şor kire nav milên xu.Biherdû destan gohên xu givaştin.
Herweku gohên cîhanê hemûyê biwan destan digirt!
- Herdû kiçên min.Evîn û jîyan.Her êkê destê wê yê dinav destê gencekî da.Milên xu yên dayine êk û qesta mala xecê dikin.
Neşîya pitir baxivit.Hişik bû,livîn jê nehat.Jor bê deng bû.
Xudana pirçê ma lihîvîya wî.
serê xu bilind kir.wek peykerekî hate pêş çavan.Deng jixu îna.Çihê xu xoş kir.Kaxez têkvedan.Dû sê caran,binê wan limêzê dan. Kuxî.Binê qelemê xu libanê mêzê da.
Ew peyker nelivî....
Tirsîya.Devê wê beş bû,çav lê zîq bûn.
Tila xu dana ser dukmekê.dû polîs û dixiturek û dû sistir,Hatine jor......

— 10 -

Çavên xu vekirin,cih ne cihê carane.
Çu polîsa zendên wî venekirin.
Xudana pirçê nedîyare.Çu ektên sor nihênyên wî tumar nakin.
Joreka paqij ü lêkdaye.Ew textê liser dirêj kirî, hizirên wî birine cihê rûdanê.Zanî çi hatîye serî. Lidur xu zifirî,kes nedît.

Serê dû sistira diwê pencera liberanberî textê wî xûya dikirin.
Dergeh yê girtîye,pencereka mezin.jora wî ya rûn kirî.Liberanberî pencerê,baxçekê mezin tijî mirovin.
Hişên wî cemîyan,çavên wî jor wêne kirin.
Birex textê wî ve, mêzeka biçûk,bitilekê avê û perdaxek yên liser.
Dengê mirovan,berê wî da wê pencera mezin.
Xu jitextî havête xwarê,neşîya gelek dûr kevit, jiber wî sondê sêlanê yê bizenda wîve girêday.
Enîya xu bi şoşa pencerê vena.Tijî çavan dîmenên ciwan bûn.
Dengê mirovan,yê çûçkan.Kenî û yaryên biçûkan,werîyana pelgên daran.Livîn û hatin ü çuna mêvanên xestê.
Zifirande rojên azadyê.
Dû biçûk yên digel seyekî yarîya dikin.Kiçeka sinêle,serê xu ya kirîye dinav sîngê hevalê xuda û ya nivîsitî.
Dû genca milên pîremêrekê nesax yên girtên û yên dinav paxçê tijî gol ü gîyada pîyasê dikin.
Jîyan diçirkeyên lezetê daye.Roj beref ava bûnê diçit.Zeratîya wê her ya pêtî dibit.
Serma şerê tîşkên wê yên nazik û şermîn dikit.
Liser şerê dirinde yê tarî û sermayê ra.Tijî bin wan dara û liser wan textên asnî mirovin.
Divan çirkeyên rojê da.mala mirovî ya germ û têr.Biheşta ser dunîyayê ye.Ligundî,sopa dara sor dibû.Qazana savarê û ya nîskê birex sopê ve didanan.Qoryê çayê liser derê sopê peqij vedidan.Çihê wî, liserê dîwanê yê raêxistî bû. Dû Balîfkên mezin.Tirarekê ava tezî.Mêdeka nanê reşandî.Dû serên pîvazan.
Xecê wek pelatînka dinîva hewşê digerîya...
Çavên wî tijî tarî bûn.Kitkite baxçe vala bû.
Serma û tarîya wê êvara direng,neşîyan wan herdû evîndaran jêk vekit.
Wek peykerê dû evîndaran,liser wî textê sar bibûne leşek.Dû kutirên evîndar,dimên wan jêkve nabit.Dibine êk gîyan.Dibine şemalik, dihelyên.Carekadî dibine çira....
Divîya dinava şoşa pencerê ra derkevit.Qesta wan evîndaran bikit.Bêjite wan.Evînî vêlbazîye. bawerîya xu pê ne înin!Divîya bêjite wan, hewe ez û xecê dîtin?!Me çend hez jiêk dikir?! Me çend êk divîya?!
Wî sondê sêlanê,ewê wek hefsarê gîyanewerekê dirinde,bilêva textî ve girêday. Zenda wî girt,nehêla biçit.

Çu jê nehat.Bû wênegirekê şareza,kamîra çavên xu êxiste ser wan evîndaran.Hemû livîn û çivêlyên wan tumar kirin.
Digel awazên kenîya wan,siwarî pêlên şev taryê bû...
Ligondê wan yê xudê jibîr kirî.Ewê dinîva gelîyekê dozexî da,wek kavle goristanan xûya dikit.
Liber derê gova pezî,lihîvîya xecê çavzlkanê digel stêrên bestyê girtîn dikir.
- Bibure,ez gîro bûm?!
- Xem nakit.Hatina te lêbûrîne.
- Min sare...Ez jiserma mirim.
- Were dibin kepenî minive.Wek tenürê ye.
- Dilê te biminive ye?Yan da nêzîkî te bim?!
- Herdû!Dilê min yê biteve.eve min fam kirî.Dilê min bû dilê te helîya.Ü bawer bike leşê min wek sopa daraye.Dê leşê te kite agir.
- Ez ditirsim,min bisojit?!
- Heker em herdû pêkve bin,bila me bisojit!
- Gotinên te serma jidilê min revand.
Lêva kepenê xu vekir.
- Were dinav dilê minda,dê pitir tena bî...
- Vê êvarê.Ez ya ji te ditirsim!
- Tirs?!Ez û tirs pêk ve najîn...
- Ez behsê tirseka dî dikim!
- Tirs hemû êkin.Êk raman didin!
- Nene..Tirsa min jidilê te ye.Ez dinavda berze bibim.Ü nizanim derkevim?!
- Ma te libere ji nav dilê min derkevî hey gawir?
- Heker cihê min xoş bit.Heker yê germ ü nerm bit.Madê buçî derkevim?!
- Were (biceribîne) da pişt rast bî....
Kenîya wan dû sê pez  jimexelî rakirin.
Xecê wek têjkewka xu havête dinav sîngê wî yê germ da.Dinav kepenê wî da berze bû.
Cihê xu liser kunîyekê kayê lipaşîya govê kirin. Gov şir bû,dengê benîşt coyna pezî digohên wanda wek mezîqeyeka xemgîn dihat.
Xewê dilê xecê dagîr kir.Gopal jidestê wî ket. Tijî govê deng kir.
Ew kafirê bû beranê tovî hêlayin.Rabû ser pîya. Pirpir jidevê xu îna.Lidûr kafireka mê zifirî.
Kafir liqulaçekê necar kir.Xu havête ser pişta wê

Hestê wî nêr kir.Destê xu jitenişta xecê vekir. Bilind kire paxila wê ya har.Benduşkek vekir. Cihê destê wî nebû.Êka dî jî vekir,tilên wî wek têşkên kuremaran libişkujka mekê wê gerîyan.
Xew giran bû,leşê wastîyay xav bû.Tila,gehên wê yên eşqê hişîyarikirin.Germa leşê wî,şanên mêyatîya wê har kirin.
Dengê gohnêlîya kafirê beran,biser ket.
Xuhê leşên wan ter kirin.Livîn zêde bû.Deng bilind bû.
Beranî ew kerê pezî hemû hişîyar kir.Tijî govê deng bû.
Dû lêvên tijî mû,bişkujka mekê wê kezandin.
Leşê wê xav bû,tijî gehên wê xoşîyeka mestane bû.
Nevîya ji wê xewna xoş hişîyar bit.Nevîya xu bilivînit.Nevîya ji wê zifiroka xoşyê da derkevit.
Berî destê wî yê dî duxwîna wê liser kemaxên wê da bînte xwar.
Dengê rewîna seyê gewir.rast rakirine ser pîya.
Bilez karê xu kirin.Xecê wek diza ji govê derket.
Dengê dergehê jora wî enîya wî ji wê şuşa sar vekir.
Dêmekê şirîn,ü tjî bişkurîn,gotê.
- Êvar baş.Tû çewanê?Başî?!
Bibure.Demê dermanên te ye....

11 –

Liberanberî mala xecê,wek wênegirekê mandîbûy rawestîya...
Çavên wî yên tijî xew û xem.Jidergehî venabin.
Her dengek,her livînek,her pêleka bay.
Mûyên leşê wî tîj dikin!
Gelek cara,xew çavên wî şêlî dikin.Dilê wî dûr dibin.Leşê wî yê mandîbûy libin wê dar goza mezin dikite komeka hestîyan.
Ew rêbar û akincyên wê kulanê yên dû dil kirîn!
Hind dibêjin yê mirîye?!Hind dibêjin yê nesaxe? Bahira pitir hizirên wan bû kesekê dermankêş dihijmêrin...!
Kes mayê xu tê nakit.Dû çavên zîq,hindek cara wê kulanê tumar dikin,carekadî dikevne bin barê giranê xew û mandîbûnê.
Xew giran bû,leş xaf kir.Çav nivandin.
Dengê qebqebka dû jina wek aveka tezî leşê wî yê nîv mirî gezandin!

Rast rabû ser xû.Çavên xu ji xewê daqotan. Bejna dû kiçên genc,kete beranberî çavên wî. Her gencekî destê xu yê havêtî ye ser milê yara xu.Ew bejnên bilind,dinav desên wanda wek dû qevtên golane.Her çend pênigaveka di dine ber maça û digivêşne nav sîngê xuda.
Dû kutirên küvî ne,nevên jirikeha sîngê wan der kevin....
Kuma wan,beref mala xecê çûn.Nevîya ji çavên xu bawer kit.
Jipirça wan jêk nîyasîn.
Pirça evînê wek ya dayka wê xecê ye.Ya hilwî û kurte.Gelek çaran,wek pirça kurika kurt dikirin.Jiber pîsatî û sipîh û kêçan û nebûna av û sabûnan ligundî.
Pirça jîyanê,ya dirêj û badaye.Pişta wê hemûyê vedişêrt.Libçukatyê digotinê bûka behrê.
Piştî hatina wan bû berlînê,pêtivî nebû pirça wê jî kurt kin.Av û sabun zehfin.
Jîyanê bejna xu çemande cihê dayika wê kilîl lê veşartî.Lidur xu zifirî kes nedît.Her çar pêk ve cûne jor.
Dengê girtina dergehî,hizirên wî cemandin. Hestê wî arand.Riha mêranyê wermand...
- Kiçên min digel dû kesên bîyanê licihekî bitinê ne?!
Weku zarvekerekê şanûya (mantûman). Destên wî şer digel bay dikirin.
- Eve ezim vî dîmenî dibînim?!Ez hinde bê namûs buym?!
Destê xu havête tenişta xu,ew çardexura liser kelexê efserê dujmnî ragirî,nedît...!
Lidur xu zifirî,çu dar ü ber nedîtin.Çu tiştên wesa neketine berdesitî.Bişêt şerê namusê pê bikit....
Kete zifiruka bê huşyê.Serê rêya liber berzebûn. Desthelat liser kelexê xu nema..
Libiçûkatyê,gelek caran pirsîyar dikir.
Dema sovî Ehmed liremezanan dihate gondî, bû kum kirina zikat û xêran.Sovî Ehmed cilên xu yên pîs jî digel xu di înan da jinkên gondî bu bişon.
Gelek caran pirsîyara jina wî dikir?Pirsîyara biçûkên wî dikir?!
Xelkê gondî digotin.Piştî çend heyivekan,sovî Ehmed jin înay,û hêşta xena bûkanyê bidestave bû.Zanî jina wî hez jikurê Melay dikir.
Rojekê jixew rabû,jina xu da düv xu,û bire mala babê wê.
Ji wê rojê were,ew jin berzebû.Kes çu jê nizanit. Kes nizanit çi lê hat?Çi lê kirin?
Herkesê pirsîyar bikit.Gelek deng pêkve dibêjin...
- Namûs barekê girane....
Gondîya hemûya dizanî,wê jinê şo bisovî Ehmed kir û yarê xu hêla.Yar jibîr kir.

Dibit her yar nebit?!Dibit hemû bêbexî bit?!
Kur û kiçan mavê evîndaryê heye.Kiçan dad dikin.Bû kuran lijinan digerin. Jinan dikujin.Mêr, linêçîrên dî digerin.
- Namûs barekê girane....
Liber dergehî rawestîya.Dengê mezîqeka har, hate goha...
Destê wî kete ser zenga dergehî.Dergeh vebû. Gencekê nîv rüs kete ber sîngî.
- Geremke?Te çi divêt?!
Bersiva wî neda.Destê xu da sîngê wî yê rüs û çû jor.
Dengê mezîqê digel kenîya kiçên wî jor kir bû keşekê sêksî.
Gencî milê wî girt.
- Dê kîve çî?!Te çi divêt?!
Çavên wî ketine çavên gencî.Destê wî ji milê xu vekir.Tiv kire bextê reş ü demanca çarde xur.
- Eve mala mine...!
- Malate?!
Bersiva wî neda,qesta kiçên xu kir.Herdû kiç yên li rex gencê dî wek pelatînka lidur ronahîya şemalkê yarîya dikin.
Lihindav serê wan rawestîya.Çi jê nehat.Çu deng û livîn nekirin.
Çavên wî tijî xwîn bûn.Dilê wî bû volkana kerb ü kwînê.
Gelek liberukên xu gerîya.Paxlên xu têkvedan. Demanca sitîlî nedîn.
Ew narincukên wek tizbîya diber şotka wîra, nedîyarin.Ew çeqoya bû xecê hinar û sêv pê sipî dikirin.Lifirukexanê jê standin.
Dengê wî gencî û gazindên wî,hemû hişîyar kirin.
Çavên kiça bienîya babê wan ket.
Qêryên wan tijî jor bûn.Xu havêtine pişt yarên xu...
- Babû?!
Herdû genca bisanahî milên wî girtin,û jixanî kirine der.
Hêşta hîvî jiwan dikir.Divîya bizanit ka ew kîne? Çi dikin digel kiçên wî?
Berî bersiva wî bête dan,berî rastyê bizanit.
Turmbêla polîsa,liber dergehî amadebû. Bersiva hemû pirsîyarên wî dan...!

-12 -

- Eve hevalê mine...
-.........
- Eve mêrê mine... Em dê divan rojan da şahîya xu kin.
-........
- Bela xu ji me veke.Bes mayê xu dijîyana me da bike.
-.........
- Em neşên heta heta ditirsa teda bijîn!
-........
- Te çi jime divêt?!Em neşên digel te bijîn.Tu neşêy me xudan bikî.
-.....
- Dayika me jibêloqîya te revî,jikerbên teda şo kir.
Birayên me jite revîn,jite ditirsîyan.Tû egerî.
Te em hemû jimal dür kirin.
Tû egerê hemû nexoşyên meyî..
-......
- Te em kirine qehbe.Te em kirine gorg lipêş çavên heval û biraderên me.Tinê te xu divêt, tinê te jîyan bû xu divêt.
Te çi di kir li wî cihî?!Ha..?!Tû limin digerîyay?! Yan lidayika me?!
Yan ewa bû me heram,bû te helale?!
-......
- Tû nizanî biçûka xudan kî.Tû neşêy digel mirovan bijî.Çi ya hatîye serê me.Tû egerî.
Bela xu jime veke.Jijîyane me derkeve.
Em jiberte kîve birevin?!heware....Heware…
Polîsekî kaxezeka amade dana ber sîngî. Qelemek kire didesitîda.
Gotê,livêrê îmza bike.Eve cara dawiyê ye,em te agadar dikin.Nabit tû mayê xu di van mirovanda bikî.Cara bêt dê sizayê te gelek dijwarbit.
Bêy kaxezê bixwînit,dibin navê xu îmza kir.
Dû polîsa milên wî girtin.Birine derê.Dû sê caran li dur xu zifirî.kes nedît digel baxivit.Kes nedît, gazindên xu bû bêjit.Kes nedît,dilê xu bû vekit. Kes nedît,hindek xemên xu yên giran pavête ser milan.
Mejîy lê şêlî bû,xwîna dilê wî fîrîya.Xemên wî bûne çîya.
Hind xu dît yê dinîva paxçekê mezin da. Lihemû rexa mirovin.Libin dara,liser textên asinî, liser rêyên bigola nexşandîn,dinav gîyay da...
Kumên biçûkan digel Mamustayên xu.Evîndar digel yarên xu.
Baxçe parçeke ji biheştê.

Deng û livîn,kenî û yaryên wan.Tijî dinîyayê jîyan kirîye.
Libin her darekê,cutek evîndaran wek şemalika bagirê evînê dihelyên.
Licihê yarîyan,biçûk wek pelatînka digel hevalên xu yarîya dikin.
Kenîya wê kiça dihêzkê da serinca wî rakêşa. Yarê wê,kemaxên wê digirt,bilind dikite bersîngê xu.dûsê maça bizurî jê distînit.Û jorda berdidte bay.Kenîya wê digel davên pirça wê ya zerDi bine peyamên aştyê.Careka dî,yara wî dizifirte ber sîngê wî.Maçekê li enîya wê didit,careka dî bihemû hêza xu pal didit berev esmanî.
Kenî ü dengê wan tijî baxçey jîyan kirîye.
..... Werîs havête wê dare tûya lipşta gondî. Destê xu havête cihê roniştinê yê zifir bû, nevîya kemaxên xecê bizirînit.Nevîya leşê wê yê nazik,sor bikit.Kepenê xu dana bin kemaxên xecê....
- Min bide bay....
Destên xu havêtine teniştên xecê.Tezîlanik biser leşîda çu xwar.
Çend carekê xecê ji wî dur diket,qotana dilê wî zêde dibû.Dima lihîvîya cara bêt,ka dê destên wî çi parça leşê wê girt?!
Carbû carê,destên xu bilind kirin.Hind hest kir, destên wî ketine ser dû hinaran.Xwîna dilê wî kire volkan.Nêratîya wî har kir.
Bay lêva kirasê wê bilind kir.Dû ranên sipî û tijî kuşt xûya kirin.
Xuha leşê wî zêde bû.Neşîya xu liber van (ixaratan) bigirt.
Xecê ji wê bilindahyê hate bersîngê wî.
Herdû milên wê girtin,ji hêzkê kêşa der,da bersîngê xu ü givaşt.Herdû bûne gomtelekê evînê.Girêl bûn nav gîyayê biharê.....
Wan xwînkarên lêk kum bûyin.Liser kelexê xecê rakir.Wek bazinekê mezin yên roniştîn. Mamustaya wan,ya dinîva wanda biherdû destan sîstemê yaryê bû wan şirove dikit...
- Her kesê min ev tepe havête ber sîngî.
Ew dê navê navdarekê çîhanê înit.Û dê bilez tepê bû hevalekî dî havêjit.Ewê dî dê navê welatê wî navdarî bêjit.Ü dê tepê bû hevalekî dî havêjit.Ewê dî dê karê wî bêjit û hosa,heta dawiyê.
Her kesê pêzanîn nebûn.Ew dê jîyaryê derkevte nîva baznî.Û wî mav nabit beşdaryê bikit heta dawiya yaryê...
Hemûya pêk ve kirine hewar ü dest qotan.
- Gelek başe...Em amadene...
Mamustayê,tepe ji vî destî,havêe destê dî. Çavên xu linêçîreka mijûl gêran. Piştî êk helbijartî,tepe havête dinav kuşa wîda.
Wî bilez tepe kire dinav distê xu yê biçûkda û hizra xu kir.

Hevalên wî yarî pê kirin' lê kirine lez...
- Dê zûbe bêje...Navekî helbjêre....
Destê xu yê tepe têda,bilind kir.Tepe havête di kuşa hevala xuda û got...
- Karil may....
Her bilez hevala wî bela tepê ji xu vekir.Bû hevaleka xu havêt ü got...
- Elmane....
Wê jî tepe bû hevalekî dî havêt û got...
- Nivîsere....
Wî hevalî jî bû êkî dî havêt ü got...
- Romannivîse....
Jiwan wêve jinekê serê xu yê dana ye ser ranê zelamê xu û ya nivîsitî. Zelam yê rojnamekê dixwînit.Lidurên wan dû biçûk yê digel seyekî yarîya dikin....
- Xecê şo kir....
- Evînê mêrê xu hêla....
- Jîyan ya bûye leş firoş....
- Welat û Kawe,yên bûyine kurên vî welatî.Yên berzebûyin....
Dinîya lipêş çava zerbû.Rê nedît.Kete ser wê kursîka liber lêva rêkê....
- Bela xu jime veke...
- Em neşên digel te bijîn....
- Tû ne mirovî...
Çavên wî tarî bûn....
- Eve mêrê mine...
- Eve hevalê mine,em dê van rojan dewata xu kin...
- Bela xu jime veke...
- Dayika me şo kir...
- Birayên me revîn...
- Tû egerî...Jiberte revîn...
Gehên naviçaên wî wermîn.
- Em neşên digel te bijîn...
- Tû her reşoyê caranî...Tû her şivanê pezî...
- Em ne pezin,dê me bidilê xu çerînî...
- Em mirovin...Bihêle em bijîn...Bihêle em jibîr bikin...
- Eve ne ew gonde...Eve ne ew cehineme,ewa em jê revîn...Ev berlîne... Berlîn...?!
Qotana dilê wî zêde bû.
- Here jime dûr keve... Bihêle em bijîn...

- Eve tû bû namirî....?!Eve belate bû jime venabit....?!
- Em neşên her jite bitirsin!Her jite birevin!Her lijêr kuntirola teda bin!
- Here jime dür keve...Dê bimire...Manate bû çî ye?!
Neşîya ronişţî xu bigirt,xu dirêj kire nav gîyayê liber lêva rê....
Deng têkel bûn.Erd livî.Esman jorda hate xwarê.
Kenîya wan biçûkên yarîya dikin,digel qêryên kiçên wî,bûne awazên leşkerî.
Dengê hatûçûya mirovan,muzîka MP3 yên wan gencan digel gazindên xecê û kiçên wê. Bûne xencer,dil lê kelaştin.
Dinîya ser ü bin bû.Qotana dilê wî zêde bû. Çav lê sor bûn.
Dengê sistirekê lihindav serî hat...
- Silametîy ye....

-13 –

Serê xu yê giran bilind kir.Ew pirça zer,lipêş çava, gewir bû.
Çavên şîn,zer xûya dikirin.Lêvên rengê xwînê, sipîtale dihatin pêş çavan!
Zanî,eve ne rastîye.Zanî eve,çavên wîne direwa lê dikin!
Çavên xu perxandin,neşîya xew û wastîyanê jê daqotit.
Firek li wê ava tezî da.Ew ewrên gewir jibîblkên çavên wî derneketin.
Livîna wê,denkê kaxezan.Çikçika qelemî. Mejyê wî hêran.
- Min çu nîne bêjim....Bela xu jimin veke....
Çend yê wastîyay bû,çend hîvî jê kirin,çend xu asê kir.
Rikmanîya çavên wê,zêdetir bûn!Qelem dinav tilên wê yên lipêş çava wek şivtana har bû.
Gelek ma,xu asê kir.Neşîya xu liber awirên wê yên jehr jê dibarî bigirt.Neşîya xu liber pêlên pirsîyarên ji çavên wê dipeşin bigirt.
Zanî çend hîvî ya jê bikit.Bikevite ser çuka, pêlava wê maç bi kit.
Di vêt rastî dîyar bit.
- Min xecê kuşt....!
Dû çavên zîq,wek yên mê gorgeka birsî.hizar pirsîyar jê dibarîn.Kete enîya wî ya xohday.
- Erê...!Min xecê kuşt û ez neyê peşêmanim....
Binînukên xu yên dirêj.çerm liser nînuka xûya beranî rakir.Xwîn tijî ser banê nînuka wî bû.
Digotin,nabit nînukên mirovî dirêj bin.Da şeytan nivêja liser nekit.

Wî digot,bû hûn nahêlin şeytanê reben nivêja bikit?!Hewe hemû tişt bû xu divêt?!Heta nivêja jî?!
Diberukên xu gerîya.Çu tişt nedîtin,wê xwînê pê paqij kit.
Dilêva kirasê xu husî...
- Divîyaba berî çend salan min xecê kuştba. Berî kiçên xu bikite qehbe.Berî kurên xu berze bikit....
Xwîn jiserê qelemê xudana çava dipeşî.
Her peyvek dinivêsî.Serê xu bilind dikire navçavên wî.
Wek şerekê dijwar,dinavbera çavên wanda rû da.
- Min xecê kuşt.
Nevîya demî ji xu bibit,kaxeza tijî peyv havête ser mêzê.êka sipî kete bin didanên qelemê wê yê har.
- Ez dizanim hûn bawer nakin min xecê kuştbit.
Destê xu yê seqet bilind kir.
Wek sîyasetmedarekê vêlbaz.
- Hêşta têra gîyanê xecê hêz ya divî destî da may.Hêşta ev destê dujmnî neşîyay bibirt.
Dişêt namusa min biparêzit.
Herweku narincukek liber pên xudana pirçê day.Hişik û bê deng ma.Qelem nemêr bû. Çavên şîn,zîq man lidevê wî yê dilerizî.
Peyva namusê.gehên wê xav kirin.Qelem dana ser sîngê kaxezên şarîyay.
Destê xu dirêj kire perdaxa avê.Da wî agirê dihinavên xuda vemirînit.
Jor bê deng bû,av liser aşî hate girtin.Gewirîya xûya hişik,bihindek ava tezî ter kir.
Divîya vî şerî sist bikit.Zanî peyvên wî gelek didijwar bûn.
- Dibit namus linik hewe tiştek dî bit?!
Dibit,têgeha hewe bû namusê newek ya mebit?!
Wek mirovekê rewşenbîr,simînarekê pêşkêş dikit.
- Ez dizanim hûn bişaşî nabînin,demê kiçek bi düv kurekî bikevit ü leşê xu bû bikite dîyarî!
Ez dizanim,hûn bişaşî nabînin,demê jinek mêrê xu dihêlit û roja dî mêrekî dî liser sîngê xu dinivînit?!
Ez van tişta jihewe dizanim!Hûn dibêjin eve azadîya kesayety ye.
Ew kêşe ü bînîna heweye.
Wek serkirdekê sîyasî,birîyareka giring didit.
- Divêt hûn jî baş bizanin.Namus linik me,piştî mirinê ye.Berî dînî ye.Berî welatî ye.Berî her tiştekî ye!

Hest kir,çend rojihelata navîn,yê bû desta diqotin.
- Em dişên gelek tişta liser xu qebûl bikin.
Em dişên hejar bijîn.Birsî bimînin.
Lê bê namusê!Tişteke,ji hêza me gelek girantire!
Herwekû çîyayek liser serî.Serê xu şor kir.
Destê wî yê seqet,hêşta yê bilind bû.
- Xecê,namusa min firot.Xecê,perda sitara me dirand.Em kirine benîştê devê heval ü neyaran.
Serê xu hejan,divîya xem û rojên burî jê daqotit.
- Xecê xu firot.Kiçên xu firotin.Kurên xu firotin. Em hemû berze kirin....
Serê xu bilind kir,çavên xu êxistine çavên wê yên şîn.
- Ew jina namusa xu bifiroşt.Ne hejî jîyanîye. Nehejî manêye...
Bê deng bû.Hêşta deng jikaxez û qelemî dihat.
- Min xecê kuşt.
Qelem harbû,gewirîya wê hişik bû.
- Dê kiçên wê jî kujim....
Dengê ketina perdaxa avê ji nav tilên xudana pirçê.dengê bumba etomî jê hat.Jor tijî agir û barot kir.
Zanî peyvên wî,jihêza wê girantir bûn.
- Dê kiçên wê jî kujim.Dê namusa xu şom.Dê xu jî kujim....!
Deng bilind bû...Dergeh vebû...
Dû polîsa milên wî girtin,birine derê......

-14 –

Lihndav kelexê xecê rawestîya.
Hest bitama sergetinê nekir.wek rojên şoreşê. dema liser kelexên dujmnî dirawestîya û çekên wan liser kelexên agir pêve radikirin.
Xecê,yaketîye ser piştê.Destên wê yên bi wê kêra disîngîra çiklî ve.
Gelek hewil daye jisîngê xu hilkêşt.neşîyaye.
Pirça wê,wek tiraşeka tarî,dêmê wê yê veşartî.
Xwîn tijî bin kelexê wê ye.Cih yê serubin bûy. Nîşana berevanîyeka dijware!
Destê xu yê sax.Havête destikê kêra disîngê xecê ra çiklî,û kêşa der.
Kêr,bilind kire beranberî çavên xu.Serê kêrê hindek çipkên xwîna tîr jê werîyan.
Cihê birînê,wek kanîyeka bihara,xwîn jê za.,.

Destê xu yê dî,dana ser birîna sîngê xecê. Destê wî ter bû.Xwîna dilê wê hêşta ya germ bû.
Destê xu disîngê xu husî.Biserê dû tila,simbêlên xu şekirin!
Tijî difina bêhna xwînê bû.Çav lê sor bûn.
Dergeh lipşt xu girt,beref kulanê çu.
Ew kêra liser kelexê xecê rakirî,wek qevteka gola.dana ber dergehê mala xecê....
Kulan gelek dirêj bû.Bêhna wî teng kir.
Her zû,şerekê nihênî,dinavbera dil û mejyê wî da rûda.Berxudana wî sist kir.Bawerî bipaşerojê nema.Jîyan lipêş çava bû yarîyeka bê mana.
Dil liser mejî zal bû ü got....
- Te jiber çi xecê kuşt?!
Mejî bersiv da...
- Jiber bênamusîya wê!
Dilî pirsîyar kir...
- Ew bênamuse û tû binamusî?Mane?
Mejî şerm ji xu kir û got...
- Wê ez fêrî bênamusyê kirim.
Dil hemû rastîya dizanit.Got...
- Tû berî wê fêrî bênamusîya bibûy.Te ew neça kir.bû xu limêrekî bigert..
Dil û mejî likulaneka teng,ketin beranberî êk. Birîyar dan,bibine dawer.
- Sizayê wî mirovê xoştivîya xu bikijit çî ye?
- Sizayê wî mirovê mala xu wêran kit çî ye?
Dil yê nazik û tirsnuk bû.
Mejî dawerekê bê dile.Birîyara tulvekirinê da.
Divêt bizutirîn dem bête bicih înan.
Hizir dinav dil û mejî da berze bû.Bilind firîn.
Berî bicih înana birîyarê.Mav dayê biçite rojên welatî.digel heval û kes ü karan.
Rojên xuş, digel xecê û kiç û kurên wê.Rojên şoreşê....
Deng nêzîk bû,xoha leşê wî zêde bû.Gehên wî xaf kirin.Dinîya lipêş çava zer bû.Deng nêzîk bû. Leşê wî giran bû.
Deng nêzîk bû,hizirên wî şêlî bûn.
Deng nêzîk bû.Mirada wî bû sîngê xecê yê tijî hîvî.Da serê xu wek gelek cara dinav memkên wêda tena veşêrt.
Deng nêzîk bû.Xecê sîngê xu vekir,pirça xu da bay.Destên xu bû givaştina leşê wî amade kirin.
Bawer nekir.bihemû hêza xu,xuhavête dinav sîngê xecê yê rüs da.

Dengê rawestîyana tirênê.Ew bajêr hişîyar kir....!

-15 –

Kelamçe jizendên wî vekirin.Danane ser kursîka her car.Hindek ava tezî danê.jikartêkirina xewê hişîyar bû.Serê xu yê giran bilind kir.Çavên wî ketine dû bizotên şîn....!
Nevîya xo mijül kit.
- Min berlîn hemû têkveda...Min elmanîya hemû têkveda...Min pirsîyara dinîyayê hemûyê kir...Min jîyan nedît.Min evîn nedît!
Axînek rahêla.
- Piştî demekê dirêj,bû min dîyar bû nemayne lielmanîya.
Gelek pirsîyar jiçavên şîn dipeşîn!
- Ez dizanim te çi divêt bêjî?!
Erê min divîya jîyanê bikujim.Min divîya evînê bikujim...
Herdû çavên şîn,zîq bûn.Qelem har bû,gorî ji kaxezê bilind kir.
- lê berî ez wan bikujim,min divîya pirsîyara wan bikim.
Jibû çi wan ev kare kir?!Çi jiwan kêm bû?!
serê xu şor kir.Destên xu biçavên xuve şidandin. Herweku,bû gîyanê xu diaxivit.
- Limin berze bûn.Ez wastîyam.Min çu çare neman.Xecê bitinê ma liber destên min.Min jî hemû kerb û kîna xu lixecê mezaxtin.
Çavên xu êxistine çavên wê yên sor dîyar dikirin.Şerm û tirs jibîr kirin...
- Erê...Min xecê bivan destan kuşt.
Hûn bawer nakin min xecê kuştbit.Hûn yên likesekî dî digerin.Hûn wesa bawerdkin,kesekî dî xecê kuştibit!
Min bivan destan xecê kuşt.
Destên xu bilind kirine hemberî çavên wê.
Destên wî wesa bilind man.Heta wastîyayin. Wek leşekê mirî,herdû destên xu berdane ser banê mêzê.Dengekî bilind jê hat.Cilivek bi xudana pirçê ket.
Lez liqelemî kir,da berevanyê ji xu bikit.
- Erê,min xecê kuşt.Min divîya xujî bikujim.
Min jîyan nema.Dê bû kê jîm?!Dê bû çi jîm?!

Dengê giryê jigewirîya wî hat.Qelemî lez kir. Agir berda pîstê kaxezê.Şerî dest pê kir.Dukêl ji kelexên mirî bilind bû.
Gelek wesa nema.Dem rawestîya.Livîn nema.
Herdû layena,alayên sipî bilind kirin.....!

-16 –

Destê xu yê rastê,jinav memkên wê yên dinav destîda xuh day,jorda bire xwar.Piştî biserê tila şehdê dûsê cara bişkuşka memkê wê yê çepê perxandî. Biwê xoha bêhna biheştê jê dihat.destê xu dinav wî gîyayê dinavda nivîsitîn gêra.destê wî kete kulîlikekê.Kulîlik kire diber pirça wê ra. Biserê lêva,cihê kulîlikê da ber maçan.
Carekadî,destê xu dana cihê berê û jorda bire xwarê.
Dest kete ser zikê mezin.Gelek caran perxand. Litiştekî berze gerîya...
- Jê bigere,yê nivisitî..
- Dê çewa hişîyar bit?!
- Te divêt hişîyar bit?!
- Erê?!
- Gelek zehmete!
- Ji bû çi zehmete?!
- Dinîya germe,û cihê wî hûyne.Mecbur nîne bête nav vê germê!
- Min divêt hişîyar bit,digel min yarîya bikit.
- Dê hişîyar bit,lê heker....?!
Genîyeka şirîn û şermîn jidêmî barî.
- Heker çi?!Ka bêje?!
- Nene.Çune. Bûte zehmete!
- Dê ka bêje ew çi tişte kurê min hişîyar dikit?! Bila çend yê zehmet bit?!
- Tû befira he dibînî?!
- Erê... Ewa liserê çîyayê gare?!
- Erê.Ew befir!
- Ê....?!
- Heker dayka kurê te hindek ji wê befirê bixut. Ew dê hişîyar bit...!
Hêdîka ji kuşa xu îna der.Rast rabû ser pîya...
- Tû here gondî,eve ez bû te çûme befirê.

Kenîya wê jidil hat.Xu girêl kire nav gîyayda. Wek sipîndarekê lihindav serê xu dît.
- Ne dilê min,ez yarîya dikim.ez bi mirim û dermanê min ew befir bit.Ez nahêlim tû biçîye wî çîyayê dûr û asê...!
- Min birîyar da,ev şeve tû befira çîyayê garey bixûy.
- Heker te ez ji dil divêm tûnaçî?!
- Min tû jidil divêy û ez dê çim.
- Min nevêt weku sîyamendî lite bêt!
- Sîyamend jiber xatira çavên xecê gîyanê xu ji dest da.Bû hêmaya dildaryê.
- Lê min nevêt ez te jidest bidim.Sîyamendê min.
- Ne xeca min,netirse,ez ne sîyamendê silîvî me. Ez şêro yê pêşmergeme.....
Deng jiseqata dergehê girtîxanê hat.Dîwana wî verevand.
Çavên hevalên wî,hizirên wî tumar dikirin. Xewinên wî,wek fîlmekê sînemê.Temaşe dikirin!
Berî silava sipêdê lihevalên xu bikit.
Dû polîsa bikelamça,silav lê kirin.Û digel xu birine derî.....
-17 –

Kursîka her car liser dirüniştt.Lipêş çava bû devê tîmsahekê birisî.
Mêza liber sîngî.Bû bîyabaneka bê dawî.
Pirça wê ya zer.Pêlên agirî jê dipeşîn.Çavên şîn, rondikên jehrê jê dibarîn.Qelem bû lulîya kilaşînkufê.Kaxez,mînên raçandîne.....!
Hemû yên lihîvîya lêvên wî yên dibin rîh û simbêla ve berze bûyin.
Lêv dihişkin.Çav yên zer bûyin.Pîstê wî sipîtale xûya dikir.
Serê xu yê giran,dana ser zenda xu.Liser banê mêzê.Çavên xu yên sor neqandin.
Mejyê wî,yê şêlî.Ser ü bin bû.Axivtinên xecî,wek nîvişkê meşkê biser ket.
- Ne şêro ne...Xu kure neke....
Hîvyên wê,hêşta tijî şanên mejyê wîne.
Dergeh vebû,dêmê xecê bikenîya wê ya şirîn. Kete beranberî dêmê wî yê agir jê dibarî.
- Şêro..?!Te xêre?Çi bûye?Biçûk bisilametn?
Xu li axivtinên wê negirt.Digel xu bire jor.
Destê xu havête pirça wê ya rojê sê çar cara difina xu dikire navda,bêhna wê dikêşa mejyê xu û bitilên xu bu şe dikir.
Bidestê dî.Kêrek jiber tenişta xu îna der.Bilind kire sîngê wê yê tijî hîvî.
Berî berevanyê jixu bikit.Birçkên xwînê tijî navçava bûn.

- Ne....Xu kure neke...
- Te ez kure kirim.Te namusa min firot.Te kiçên min firotin.Te kurên min berze kirin.Te mala min xirap kir,te... Te...
Digel axivtinên xu.Kêr jisîngê wê dikêşa der û bilind dikire cihekî dî.
Xecê destê wî girt.
- Raweste.Berî tû xulyê biserê xu wer bikî.Divêt tû rastyê bizanî!
- Rastîya çi?!Min nevêt goh liçu direwên dî bibim.Min biçavên xu dît.
- Ewa te dîtî,min ageh jî nîne.Ez jî nerazî me.
- Piştî çi?Tû eger bûy,tû harîkar bûy,te gewadî bû wan dikir.
- Kes eger nîne jite pêve.Te mala me wêran kir. Te em hemû berze kirin.Te neşîya xu bigihurî. Tû her may reşoyê şivan.Tû ne hatî ye gihurîn.Tû her ew mirovê dinîya nedîtî.Te divîya gondî bi çîya û pez û kepenê xuve digel xu bînî ye berlînê.Te divîya me wek pezî bigopalî xudan bikî.Em neşên digel te bijît.Te ne hêla em ji kevilujankê xu derkevin.Te em berze kirin.Te em wek xu mirandin.Min gelek xu biteve wastand. Date bikime mirov.Te fêrî jîyana mirova bikim.
- Erê...Te divîya ez bibime gewadê te.Te dikuşa êkî da bibînim,çavên xu şor bikim.Te divîya biserê xu bikevî.Tedivîya wek jinên berlînê bijî.Her roj dinav nivîyna êkî da binivî...?!
- Ne.Min bikuje lê bêbextyê limin neke.Min namusa te ya parastî.Heta te ez berdaym.Başî min ya şo kirî wek her jinekê.Yan te jin divîn û min mêr nevîn?!
- Û kiçên te?Tû baş dizanî likîvene?Û çi kar dikin?
- Herdû di şo kirî ne.Ew kêşeya mêrên wane. Min jî wesa goh lê bûye.?Ez bawer nakim.Û nebidlê mine,ez jî nerazî me.
- Te fêrî qehbetyê kirin.Te rê nîşa wan da.Te...
- Min yan te?!Ew kî bû nîv şev serxoş dihate mal?!Ew kî bû pare jiçizdankên wan didizîn û dikirine dipaxlên qehba da?!
Destê kêr têda harbû.Neva pitir nihênyên wî aşkira bibin.Jorda weşande dilê wê...
- Dane...Lêbide...Min pirtpirt bike.Lê baş bizane min namusa te nefirotîye.Min divîya xu biparêzim.Min wek te nekirîye.Her roj dikuşa jinekê da.Heta qedera wî gehandî ye nivîna kiça wî ya bê xudan..Tiv,Hey pênamus...
Dane,te jimêje ez ya kuştîm.Dane... Dane...
Nevîya bikite hewar,nevîya bikite qêrî.Tinê fizkên xwîna dilê wê.Berevanî jigîyanê wê dikirin.
Çav lê tarî kirin.Zal nema liser livîna destê xu yê kêr têda.Dest wek amîrekê utumatîk kar dikir.

- Dê bi xû.Te gelek kul kirîne dilê min.Eve sizayê te ye.Eve dawiya her jineka namus firoşe.
Şerî êklayenî dijwar bû.Xecê kete gefizka mirinê.Nevîya berevanyê jigîyanê xu bikit.Tinê berevanîya wê jinamusa wê xort bû.
Dizanî şêro bawer nakit.Nevêt bawer bikit!
Divîya gohek hebit rastyê wergirt.Da rastî berze nebit.Bila gîyanê wê gorî wê rastyê bit.
Kêr lidüf kêrê.Lisîngê nazik diçiklîn.
Ne wastîya.Kelex kete bin cencera kêrên wî.
Ne vîya çavên xu vekit.Ditirsa xecê bikenîya xu ya şirîn,gazinda jê bikit.Ditirsîya xecê rabite ve, bidite ber sîngê xu wek berê.Ditirsîya.ev karê dikit.Bibite rastî.Ditirsîya,xecê birastî kuştbit...!
Serê xu bilind kir...
- Min xecê kuşt....!
Cilfek bixudana pirçê ket.Jinav davên hiriz û pirça xu derket.Dest da qelemî,xwîn jiserê qelemê wê rişt.
- Berî ez xecê bikuşim.Wê ez kuştbûm.Wê jîyana min kirbû goristan.Dinîya lipêş çavên min tarî kirbû.Çu nemabû ez bû bijîm.Kes nemabû ez bû bijîm. Hewe bû ew dad nekir?!Hewe bû ew zîndan nekir?!
Ez yê mirî me.Eve jimêje ez yê mirî.
Tinê hind gîyan dileşê min da mabû.Ez bişêm xecê pê bikujim.
Wek şervanekê bê umêd...
- Min xecê kuşt.
Çavên xu perxandin.Rondik digel kilmîşî têkel bûn.Bêhna wî biser neket.Firfir jidifina wî hat. Awazên giryê jigerîya wî derketin.
- Min xecê kuşt.....Dê xu jî kujim....!

— 18 –

Şevê,leşkerê xu lihemû kun ü qolaçên kirtîxanê belav kirin.Jor bê deng bû.Ew lêvên wastîyay yên pist pist dikirin.Kitkite ketine davên xewa har.Livîn hatin serkut kirin.Çavên wî yên zîq, bibanê jorê ve mane hilawîstî.
Polîsên şevê yên taybet,lihindav serî rawestîyan Pistoka wî girtin,bilind kirine ser textê sar.
liberanberî dadwerekî xudan wijdan.

Şev jinîvê burî,kulan divalane,bajêr yê nivistîye. Tila xu dana ser zenga dergehî û her lêda.
Tijî malê deng kir.
Xecê biçilkên şevê,dergeh bû vekir.Bizimanê nîv lal,mejyê tijî kihul.
- Tû bû dergehî zû venakî?Te hinde çi dikir?
Xecê milê wî girt,bire dijora xuve.Dana ser textî.
- Şêro,dilê min,dengê xu bilind neke,biçûk dinivistîne.Şerme jiber cîrana,dê vê nîv şevê polîsa înine me!
- Bila cîran serê xu lidîwarin bidin.Ez jipolîsan natirsim.
Xecê cilkên wî jiber kirin.Dirêj kire ser cihê wî.
- Şêro...Bismam,hosa bûte dest nadit.Tû xudan biçûkî,tû ne gencî,vê nîv şevê serxoş diêye mal. Tû şerm jixelkî nakî,matû şerm jibiçûkên xu jî nakî?!
Divîya bersva wê bidit,nehêla.
- Tû heta nihu likîve bûy?Tû digel kê bûy?Min divêt bizanim?!
- Ew ne karê teye!Vê pirsîyarê çucar jimin nekî! Ez azadim.Çi bikim!Digel kê bim!Te zanî?!Yan carekadî bû te bêjim?!
- Ne....Min nezanî.Divêt tû jî baş bizanî....
Tila xu kire dinav çavara.Her zû peşêman bû. Zanî mejyê wî tijî kihule.Cihê çu amuşkarî û gefa nîne.Lihêfa wî biser kelexê wî yê nîv mirî dada,dergeh lê girt.Bermayîya şevê lijora kiçên xu bitinê burand.
Sipêdê,zû mal tijî deng bû.Her çendekê xecê tila xu ya şehdê dida lêvên xu.
- Hişşiş...Dengî nekin,babê hewe yê nivisitîye...!
Bû biçûka seyir bû.Babê wan her vî demî yê nivisitîye?!Jibû çi dayika wan evro hosa ya xemxure?!
Xecê hest bipirsîyarên çavên wan di kir.
- Babê hewe yê nesaxe.Divêt baş binivit....!
Kesê bawer nekir.Kitkite xatir xwastin,beref xwandegehên xu çûn.
Dengê yê jihemûya biçûktir hat..
- Eve ez çûm.Bixatira hewe..
Xecê bersiva wî da.
- Hişîyarî xube.Nemîne birêve.Gohê xu bide Mamstayên xu....
Mal bê deng bû,çavên wî tijî xewe,kartêkirina kihulê hêşta serê wî bernedaye.
Xecê,perdaxeka avê û kupekê qehwê danane bersîngî.liser textê nivistinê.
- Sipêde baş dilê min.
Serê xu bilind kir,bejna xecê wek nêrgizeka geş,lihindav serî,tijî dêmê wê kenî û bişkurîne.
- Sipêde baş...

- Tû têr nivisitî?!
Zanî dadkirina wî dê dest pê kit!
- Te çi divêt bêjî,hema bêje?!Ez yê amademe!
- Min divêt bêjim tû hemû gîyanê minî.Tû hîvî û umêdên minî..
Destê xu bidevî vene,nehêla bidilê xu baxivit.
Destê wî girt kêşa ber sîngê xu.
- Eve netinê gotinin.Min divêt te bikime didilê xu da,ez jite têr nabim.
Xu asê kir,destê xu jinav destê wê kêşa der.
- Bêje.Ez dizanim eve despêka şerekî ye?
- Şerê çi dilê min?Heker min hindek gazinde ji dilê xu kirin.Ma ew şere?!
- Gohên min divekirîne...
- Dê qehwa xu vexû..Em dê...
- Min zanî ew qehwe neya biherweye...!
- Ma eve cara êkê ye ez qehwê bû tediînme ser textê te?!Hey bêbext!
- Ne....Lê her car tû dadgehekê bimin dikî.Tû min dişûy.Min dikîye pêlava xu.
- Tû dilê minî,tû taca serê minî,tû...
- Ya te divêt dê bêjî,yan malê bû te bihêlim ü biçim?!
- Min çu nîne bêjim.Tinê dê hindek rastîya bûte bêjim,ü ez baş dizanim tû mirovekê rasgo û xudan wijdanî.Heker tû razî,eva tû dikê?Da ez agirî berdime xu û mala xu,
- Rastyên çi?Te vê carê çi libere bêjî?!
Wek daykeka danemir.Destê wî girt û perxand.
- Berê xu bide mala xu.Te çar biçûk yên heyin. Tû xudan mal û jin nav ü dengî.Çi jite kême tû van kara dikî?Kiçên te yên mezin bûyin.Hemû tişta dizanin.Pirsîyar dikin.Bawer ji gotinên xelkî dikin.
- ê..?!Hewe çigoh lê bûye?Ez çi karên şaş dikim?!
- Şêro dilê min.Tû baş dizanî min tû jigîyanê xu xoştir divêy!Ez gohê xu nadime gotinên xelkî.
Bîne bîra xu,evîna me......
- Dirêj neke.Serê min yê wermî ye....
Dengê xu bilind tir kir.
- Şêro.Eve berlîne,berlîn.Tû baş dizanî berlîn anku çi?!Heker tû nizanî da bûte bêjim?!
Deng jê nehat,çavên xu neqandin.Da enîya wê ya girê nebînit.
- Berlîn.Anku dinîya.Pêşketin.Zanîn.Paşeroj. Jîyan.Her tiştê dilê te bixwazit...
Eve jilayekî ve....!

Û jilayê dî ve...Berlîn,anku,zifirok.Berzebûn.Xu firotin.Helîyan dinav pelên pêşketinê da.Ketin bin pîya.
Ankû cehinem..Şêro anku cehinem?Tezanî?!
Kenîyeka şermîn kete dêmê wî.
- Min jinû zanî,xecê tû ya bûye feylesuf û zana..
- Çi feylesuf û zana pê nevîn.Tû biçavên xu dibînî ew cawazîya em ketînê. Gondê me jîyana xu lê burandî,di zikê gelîyekê kure da bû.Ne av ü ne rê û ne kareb ü ne xwandingeh û ne û ne û ne û....
Bişev û rojeka,em xu liberlînê bibînin!Tû dizanî eve cawazîyeka çend mezin û metirsîdare?!
Her weku hindek axivtin gehiştîne mejyê wî.Xu şir kir.
- Şêro.Em herdû nexwandewarin.Em herdû çu zimana nizanin.Em wek ker ü lalanin.Em çu ji dinîyadarîya van welatan nizanin.Divêt em xu bigihurin.Divêt em xu fêrbikin.Divêt em bizanin bijîn.Divêt em bizanin biçûkên xu xudan kin.
- Erê.Te divêt em wek berlînîya xu rüs bikin.
Em wek wan goştê berazî bixûn.Wek wan biçine dîskûyan...
- Nene.Dilê min ne.Nîveka xelkê berlînê bixû van karan nakin.Em xudan biçûkin.Biçûkên me pêtivî harîkarîya mene.Zanîn û xwandin ne şermin.Em yên livî welatî,divêt em zimanê wan bizanin.Divêt em hindek jijîyana wan bizanin. Da em bişên biçûkên xu biparêzin jişaşyên vê
pêşketinê
- Wesa dîyare,te divêt tiştekî bêjî.ü bikî?!
- Min divêt em pêk ve bêjin û pêk ve bikin!
- Min çu pî çê nabit bikim.ü min nevêt çu direwa bikim.
- Te gelek tişt pê çê dibin.Tû gîyanê meyî.Tû bab û birayê meyî.Em bite dijîn.Tinê..Tinê..
- Tinê çi?Hema bêje ez dizanim te tiştek libere bikî?!
Hest bisist bûnê kir,nevîya destên xu bilind kit.
- Min çu liber nîne dilê min.Wek min gotî,divêt me ageh jibiçûkên xu hebit.
- Ma çi jibiçûkên me kême?!
- Bab jê kême.
- Ha..?!we bêje.Te divên ez biroj bûte amana bişom,tû biçîye karî û bişev libin serê te,xizmeta te bikim..
- Bê bext nebe.Te carekê fireka avê daye me?! Tû heta nîvro yê nivisitî.Û hêşta em nehatîne mal.Tû diçîye derê.Berê sipêdê dêye mal yê serxoş û neve mirov...
- Ma dê bû hewe çikim?Hûn bikarên min razî nabin.

- Wan tû divêy.Bû wan baxive.Bila bizanin wan jî milletek yê hey.Wan jî welatek yê hey.Wan jî hindek rewişt û tîtal yên hey.Divêt ew jî başî û xirabyê jêk bizanin.
- Ew xema te ye.Tû dayika wanî,her yên digel te.
- Tû jî babê wanî.Ew pitir pêtivî tene.Biçûk gelek bawer ji babê dikin û çav lê dikin.
- Bela xu jimin veke.
- Ez bela xu jite venakim.Û ez razî nabim tû heta nîv şev liderê bî û dema bêye mal jî yê ture û serxoş bî.
- Heker tû bela xu jimin venekî!Ez dê malê bûte hêlim û...
- Erê.Te divêt bidilê xu bikevî.Her weku ez nizanim tû û hevalên xu yên wek xu çi di kin?! Ez baş dizanim hûn çi di kin!Û likîve parên xu xerc dikin?!
- Wesa dîyare tû ya lişerekî digerî!
- Nexêr.Ez ya lite digerim.Te jixewa giran hişîyar dikim.Rastîya bûte dibêjim.Berî tû berze bibî.Ü mejî digel xu berze bikî.Berî tu mala me xirab bikî...
- Ez dê hewe berze kim?!Yan seruberê te,dê me şermzar kin?!Dê me kite benîştê devên xelkî?
- Şêro..Gohê xu baş bide min!Te tinê dû helbjar hene...Divêt tû êkê bihelbjêrî. Serê xu bilind kire navçavên wê yên tijî tirs.
- Tû gelek ya ezman dirêj bûy.
- Wek min gotî.Te tinê dû helbjar hene.Û divêt tû xu êk dil kî.Da bişêy jîyana xu bibî ye serî.
Destên xu dane pişt gohên xu,gohên xu baş vekirin..
- Eve min gohên xu bûte kirine kuvik.Ka bêje te çi libere bêjî?!
- Heker te bivêt livî welatî bijî.Divêt tû xu bû jîyana wan amade bikî.Xu fêrî ziman û karî bikî. Liber biçûkên xu rawestî da berze nebin.
Yan jî....!
- Yan çi?!Wesa dîyar e tû ya bûye mêrê min.Û ez yê bûyme jina te ü min ageh jê ne?!
- Ne demê tiranaye.Min çucar mavê te wek mêr jibîr nekirîye.
- Pa?Yan çi?!Tû hereşa çi limin dikî?!
- Yan hilû destê me bigire,da bizifirine gondê em jê hatîn.Hêşta gondîya çu şivanên dî bû xu negirtîn!
- Tû jineka bê şerev û bê namûsî.Herdem tû şivanîya min dikîye çikî ü didîye nav çavên min. Herwekû min qiphetek kirî!

- Ne şêro...Eve rastî ye.Te jişivanyê pêve çu karên dî pêçênabit.Tû neşêy çu karan bikî...
- Bes ezmanê xu dirêj bike.Te birîyara xu ya day Hema bêje ka te çilibere bêjî?!
- Erê...Min libere xu bigihorim.Min libere xu fêrî ziman û xwandin û karan bikim.Min libere wek xelkê vî welatî bijîm.Da bişêm biçûkên xu biparêzim.Da jîyana gondî jibîr bikim.Tezanî.. Lê?!
- Lê çi?!Ha?!Ez astengim?!
Hest bibêhêzîya wî kir.
- Ne,dilê min.Tû ne astengî.Em pêtivî tene.Me harîkarîya te divêt.Em bêy te neşên çu bikin. Em bêy te neşên bijîn.Mene hêle bitinê,barê me girane,harî min bike.Em dê livî welatî berzebin.Eve berlîne,eve derîyayeka bê dawîye.Tijî nehing û dirindene.Digel me be.Tû bû me hêz û şîyanî.Mene hêle...Me nehêle....
Serê xu dana ser sîngê wî.
- Em bêy te najîn.Em bêy te dê berze bin.Me nehêle....
Deng biser ket.Livîna wî zêde bû.Jor ron kirin. Dûsê heval lihindav serî rawestîyan...
- Şêro.....?!Şêro....Texêre?Hilû jixew rabe...?!

— 19 -

Hêşta tijî çava xewe.Hêşta gehên wî dinivisitîne.
Dû polîsa milên wî girtin.Liber dergehekî rawestandin.Dergeh vekirin.Destên wî jiqeyda azadkirin.Berdane jor.
Navê xudê îna.Pê rastê havête jor.Berî silav kit. Dergeh lipşt hate girtin.
Kete beranberî bejneka bilind,pirçeka zêrîn,dû çavên şîn,dêmekê befirîn.
Hirza bire rojên zavatîya wî.
Dû hevala milên wî girtin.Bira zava kete pêşîya wan.Liber dergehê joreka bê seruber milên wî berdan.Navê xudê îna,dergehê tenekê lada. bipê rastê hilda jor.
Xecê biwê ciwanî û xemla xuve libenda wî bû.

Liqolaçekê destekî nivînên kevin dirayêxisitî bûn. Zanî ew nivîn neyên wanin. Xecê bibejna bilind jipêşve rabû.Berî dergehî lipşt xu bigirt.Xecê xu havête dinav sîngê wî da.
Vê sipêdê,gelek ma lihîvîya xecê.Gelek ma lihîvîya kenîya wê.Ma lihîvîya germa sîngê wê.
Dengê birazavay jikaxez û qelemên xudana pirçê hat.Hemû hîvîn wî stewir kirin.Ew kursîka bûye gorê wî.Libenda wî bû.Ew mêza bûye, helanê liser sîngê wî.Libenda wî bû.Ew bejna zirav,lipêş çava bû bejna zelamekê nemêr.
Qelemê wê bû kilka düpişkî.Kaxez bûne bîyabaneka berîn.
Dîwar hatine êk.Ban,nêzîkî erdî bû.Pirça wê ya zêrîn.Bûne têşkên kuremaran.
Şerê man ü nemanê dest pê kir.
Wek şervanekê bê umêd.Xu havête diçeperê xu yê aşkira da,libenda golleyeka kore...
Zanî biwî çekê liber destî,neşêt berevanyê ji gîyanê xu bikit.Çekê dujminê wî yê pêşketî ye. Çu çeper xu liber nagirin.
Dû çavên zîq,tijî xew,wek kamîreka şêlî.Dêmê wê yê befirîn,çavên wê yên şîn.Lipşt mêzê tumar dikirin.
- Min xecê kuşt...
Yarî binînukên xu yên dirêj kirin.
Qelem fêrî vê ristê bibû.Bisanahî liser sîngê kaxezê nexşand.Ma li hîvîya risteka nû.
- Min divîya xujî bikujim.
Ev riste jî ya vecy bû.Qelem newastîya.Ma li benda tiştekê nû.
- Piştî xecê ketîye dizifiruka mirinê da.Gelek tişt bû min dîyar kirin.Perde liser gelek tişta ladan.
Piştî kêra êkê min disîngî çiklandî.Kete ser piştê. Destê min girt ü got...
- Xu kure neke,mala xu xirap neke,gohê xu nede gotinên fesadan.
Min gotê...
- Te mala me xirap kir,te serê me şor kir.Te namusa me bi erzanî firot.Te em berze kirin.
Destê xu yê dî havête kêra disîngê xo ra.
ü got...
- Eva hatîye serê me tû egerî.Goneha teye.Te em hêlan û bidüv binê xu ketî.Te em tuşî van şaşîya kirin.Tû hermay wek xu,reşkoyê şivan.Te neşîya xu bigihurî.Te gond û pez û kepenê xu digel înane berlînê.
Min gotê...
- Te divîya ez gewadyê bû te û kiçên te bikim.

Tiv kire nav çavên min.
ü got..
- Heker tû gewad nebay.Da me parêzî.Da harî min kî.Da liber min ü kiçên xu rawestî.Ne bi düv kîrê xu kevî û her roj dikuşa jineka qehbeda nivî...
Min kêr ji sîngî îna der,bihemû hêza xu lichekî dî da.
Cilivek bixudana pirçê ket.Çav lê zîq kirin.
- Min gotê...
Te ez vêrî qehba kirim.Te ez fêrî derê kirim.
Wê got..
- Direwa neke.Min çend digote te,were harî min.Xu fêrbike.Xu bigihore.Karbike.Digel biçûka rûne.Digel biçûka biaxive.Digel wan yarîya bike. Harî min bike.Ez bitê neşêm çar biçûka xudan bikim.
Min gotê...
- Te biçûk jimin dûr kirin.Te her şivanîya min dida pêş çavên min ü yên wan.Ez neşêm digel wan rûnim.Ez şerm ji wan dikim.
Wê got...
- Tû şerm jibênamusyên xu dikî,tû şerm jibê mejî ü şivanîya xu dikî.Te neşîya xu pêş bêxî.Te neşîya jidavên gondî rizgar bî.
Çend behsê gondî dikir,çend behsê şivanî û kepenê min dikir.
Kêr lisîngê wê zêde dibûn.
Her gazinde û lumên wê zêde dibûn.Gehên destê min stûr dibûn.Kêr disîngê wêra zêde dibûn.
Dengê wê û hîvîya wê ya dawyê Biser dengê lêdana kêrên min ket.Biser dengê kerb û kîna min ket...
Got..
- Were harî min...Xu kure neke...Malaxu xirab neke.Gohê xu nede fesadan... Tilên xu wek şey dinav pirça xu ya qijavij çiklandin.Pirça xu biwan tilên dilerizîn,şe kirin.
- Min xecê kuşt.
Ez neyê peşêmanim...!
Serê xu bilind kir,piştî tilên xu jinav pirça xu ya ne şekirî,înaye der.
- Ez neyê peşêmanim....
Serbilindîya wî gelek nema.Serê xu şor kire hindav sîngê xu yê tijî kuvan.
- Erê...Ez neyê peşêmanim.Lê ez jî tawanbarim. Divêt êk min jî bikujit!
Qelemî lez kir.Herdû çavên şîn,zîq bûn.
- Ez jî tawanbarim.Ez jî egerim.Goneha min jî bû. Min jî ew mal tuşî berzebûnê kir.

Dengê xu nizim kir,nedivîya xecê digora xuda, goh lidanpêdana wî bibit.
- Erê...Xecê rast digot.Ez bidûv xoşyên xu ketim. Heta nîvro dixew,û bişev serxoş dihatime mal. Min ageh jimal û biçûkan ne mabû.Min ne di zanî çi dikin? Kîve diçin?
Her filsê dihate destê min,min dikire dipaxla jineka leş firoş da.
Ez gelek jimal dûr ketim.Min rengê biçûkên xu ji bîr kir.
Ez jixew radibûm,ew diçûne xwandingehan.Ez nîv şev dihatim mal,ew dinivîsitî bûn.
Gotinên xecê diserî da deng vedan..
- Te nevêt biçûkên xu bibînî.Tû nizanî dê çi bû wan bêjî.Tû çu jidinîyayê nizanî.Tû nizanî biçûka xudan bi kî.Tinê te şivanî pê çê dibit....
- Lirojên bêhinvedana wan.
Serê xu şor kir.Zanî xecê dê digora xuda goh lê bit.
- Lirojên bêhinvekana wan.Min nedivîya wan bibînim.Min hest dikir.Ew bimin razî nabin.Ew min kêm di hijmêrin.Ew şerm dikin,ez babê wan.
Bê ding bû,devtera hizirên xu serubin kir.
Lipeyvekê gerîya suhbeteka dî dest pê bikit.
- Ez û xecê jêk çûne paş.Em coda dinivîstin.Min jora nivistina xu bû wê hêla.Ez lijora mêvana nivistim.
Serê xu jinav milên xu kêşa der,çavên xu zîq kirin.Likesekî gerîya bawer jê bikit.
- Lê ew eger bû.Wê divîya ez jimal dûr kevim. Wê ez lipêş çavên biçûkên min reş kir bûm.Wê divîya hemû tişt bikevne didestê wê da.Wê divîya ew bibite mêrê min.
Çu guhên vekirî ne dîtin,dengê xu nizim kir. Axivtinên wî jikûratîya hinavên wî derdiketin.
- Wê divîya ez weku wê xu bigihurim.
Ez jireşoyê şivan bibime elmanekê çav şîn û pirç zer.
Xudana pirça zer,serê xu bilind kir.Bêy hevsarê qelemê xu sist kit.
- Wê divîya ez bibime elman.Wê divîya ez fêrî kumputer û ezmana bibim.
Bêhneka kûr hilkêşa....
- Birastî.Wê divîya ez bibime elman.
Kenîyeka xav kete ser dêmê wî yê zer.
- Reşkoyê şivan.Bibite elmanekê pirç zer û çav şîn.
Herdû destên xu biserê xu yê xelek hosîn.
Jorda danane ser çavên xu û şidandin.

- Min neşîya bibime elman.Min neşîya pirça xu zer kim.Çavên min yên reş,ne bidilê wê bûn.
Rastîya çîroka me.Eve ye.
Min neşîya xu bigihurim.ü ya rast tir,min ne vîya xu bigihurim.Ez çavên xu yên reş.Na dime biçavên şîn.Pirça min ya reş,liber dilê min ji pirçeka zer ciwantire.
Erê..Min neşîya xu bigihurim.Min neşîya fêrî kumpîterî bibim.Min neşîya çu kara bikim.
Min neşîya xu bigihurim.
Wê jî neşîya min bigihurt.
Em jêk çûne paş.
Dinav şer û arêşên meda,biçûkên me berze bûn.Me ageh jiwan nema.Her êk jime bi arêşên xu ve mijül bû.Me biçûk jibîr kirin.
Bê deng bû,gelek hizir kirin.Çavên xu neqandin. Bêhneka kûr hilkêşa.
- Şevekê..bû mîztinê ez jixew rabûm.
Min hindek ava tezî vexwar.Hişên min kum bûn. Ez gelek jibiçûkên xu xerîb bibum.Min divîya bibînim.Min qesta jorên wan kir.
Lêvên wî lerizîn.Dûsê rondik jiçavên wî hatine xwarê,herzû dinav rîhên wî yên dirêj da berze bûn.
- Min derê jora jîyanê vekir...
Dengê giryê ji axivtinên wî hat.
- Cihê jîyanê yê vala bû.
Min sehkire demjmêrê.Jinîva şevê bûrî bû.Min neşîya xu ragirim.Wê nîv şevê min qesta jora xecê kir.Û jixew hişîyar kir.
Xecê wesa hizir kir,ez yê serxoşim.
Min suhbeta jîyanê bû kir.Her biçuve wernegirt.
Min kire hewar û dengê xu bilind kir.Bû xecê nexem bû.Xu pitir dinav nivînên xu da veşart.
Destê xu bidevê min vena û got...
- Nîv şeve,dengê xu bilind neke.Dibit limala hevaleka xu mabit?!Xema wê nexû.
Ma te kengî ageh ji xu bûye?Heta tu pirsîyara biçûkên xu bi kî?!Here binive ew ne xema te ye!
Gotinên wê,diserê minda bûne zengil ü deng vedidan.Mejyê min ron kirin.Ez mam hişîyar heta sipêdî.
Sipêdê hemû jixew rabûn,çune ser kar ü xwandinên xu.Ez Mam limal.Lihîvîya jîyanê.
Êvarî dîsan hemû hatin.Tinê jîyan nehat.Jîyan dîyar nebû.

Dilê min kete.Gomanê,hizar pirsîyar ji nav çavên min dibarîn.
Xecê zanî ez yê lirastyê digirem,û yê rişdim bizanim.
Karê xu kir û derket.Piştê demekî kêm,hate mal. Jîyan digel bû.Her liderî,bersiva pirsîyarên min dan.
Jîyan hate nik min û got..
- Bibure bab.Ez limala hevaleka xu bûm.Dayik û babên wê nelimal bûn.Divîya ez linik wê bim....
Min bawer nekir.Lê min çu pê çê nebû.Divîya ez bawer bikim.
Dest da perdaxa avê biser agirê dilê xuda kir.
- Wesa dîyarbû,xecê nedişîya her tiştê bivêt bikit.Lewa birîyar da min jimalê bikite der.Da bi dilê xu bikevit.
Piştê min gelek mayê xu dikar û jîyana wê da kirî.Piştî min gelek pirsîyar û lidûv çûn digel dikirîn.
Çavên xu neqandin.Dengê xu nizim kir.Bêhna xu kûr hil kêşa.
- Nîv şevekê dû polîs liber derê mala min lihîvîya min bûn.Daxwaza lêburînê jimin kirin. Gotin..
Bibure,nabit tû biçîye vê malê.
Min hest bikarestê kir.Lê min nedivîya bawer bikim.Ez pêkenîm û min gote wan.
- Eve mala mine.Hûn dizanin yan ne?!
Wan gotin..
Em baş dizanin.Lê jina te xecê,daxwaza berdanê ya kirî.Û nevêt tû digel wê û biçûkên wê bijî.Ü em yên birîyara dadgehê bicih di înin.
Min gelek hewil dan.min gelek xu asê kir.Tinê min divîya bêjime xecê te bû wekir?!Te çi jimin di vêt?!Limin bibure!Ez dê xulamînîya te kim.Ez dê goh û çavên xu girim.
Polîsa milên min girtin.Ez birme cihekî taybet. Kaxeza dadgehê nîşa min dan.Dîtina xecê û ya biçûkan limin qedexe kirin.
Mal bû xecê ma.Xecê bidilê xu ket.
Piştî demekî kêm.Xecê şo kir.
Piştî demekî kêm.Jîyan jimalê derket,biserê xu ket.
Piştî demekî kêm.Evînê mêre xo hêla .
Welat kete ser cadê û tûşî heşîş û dermanka bû.
Mal bû xecê ma.Xecê mêrê xu îna ser mala min.Ew bû xudanê malê.Ew bü babê biçûkên min.
Min çu pê çê nebû.Min neşîya çu bikim.Barê min giran bû.Xemên min zêde bûn.

Min heval neman.Min kes nema harî min barê min helgirt.Hevalê min bû şoşa areqê.
Heşîş û dermanka barê min sivik kirin.Min xu û dinîya hemû jibîr kirin.
Ez ketim ber lêvên çada û nav paxên giştî.Ez wek gîyanewerekî dijîyam.Xwarin jitenekên gilêşî peyda dikir.
Ez gelek wesa Mam.Hevalekî xelkê welatê me. Ez ji wê berzebûnê rizgar kirim.
Xuzî ez di wê zifirokê da mabam heta mirinê. Eva hatî ye serê min biba xewin. Jor bê deng bû.Tinê wek nerazîbûnê jikaxezê. xirxir jiqelemê xudana pirçê dihat.
- Wî hevalî,ez birime mala xu.Gelek çavê xu da min.Ez birime dixtura daxwaza harîkaryê bû min kir.
Carekadî,ez hatim ser hişên xu,û bû me mirov.
Min ageh jixu bû.Min pirsîyara biçûkên xu kir.
Xecê limin berze bû.Evîn limin berze bû.Ez ji wan bê hîvî bûm.
Min Kawe licihê xudankirina biçûkên bê xwan dît.
Min welat wek kelexekî mirî,liber dîwarê westgeha berlînê dît.
Min... Min...Kiça xu jîyan....
Min kiça xu jîyan licihê leş firoşan dinav nivîna xu da dît....!!

- 20 –

Hola çaverê kirinê lifirokexana berlîn ya navdewletî.Tijî mirove.
Her weku xelkê berlîn û dewru bera.Dê berlîn çul kin.
Herçend çirkeyeka.Firukek bilind dibit û êk dikefite erdî.
Bîra kunstêngên nav reza îna bîra wî.Gelek cara lihindav kunstêngekê dirawestîya.Stêng dihijmartin.
Dengê bilind bûyê,mûyên leşê wî kirine derzîk. Çavên xu gîran tijî hemû ciha çaverî yên mêvan û xoştivyên xune.
Dêmên wan,tijî hîvî û bişkurînin.Her çendekê bireka mirovan jikuneka hulê di êne der.Li nîva holê digehine çaverêyin xu.Dibite kumbuneka kenî û maç û hembêzkirinî.
Herzû kitkite holê dihêlin ü qesta derê dikin.

Lirexê dî.Wek werîsî mirov yên lipşt êk,qesta kuneka dî dikin.Û diçine beref firokên amade...
lihemû ciha,barana keyiv û hîvîya dibart.
Kes jikuntirulî natirst.Pasporta kesê neya sexte ye.Kes ne yê bê xudane.Kes jicîhaneka cuda ne hatîye.Kes jidemê burî ne zifirîye.
Tinê ew ditirst.Tinê dilê wî jiqotanê narawestit. Tinê mêvanên wî yên jistêreka dî hatîn.Tijî paxlên wan tirse.Ezmanên wan dibirîne.Çavên wan ditarî ne.
Çend deng jibilind bûyê di êt.Salek jijyê wî kêm dibit.Gehên dilê wî diwermin.Çav lê zîq dibin.
Gelek stêng hijmartin.Gelek firoke hijmartin. Mêvanên wî dîyar nebûn.
Enîya xu biwê şoşa pencera beranberî gorepana firokexanê vena.Tijî çavên xu dîmenên firokên mezin kirin.
Dûdû sê sê firoke pêk ve bilind dibin,hindî wan didadine erdî.
Çara êkê dijîyana xuda,nêzîkî firokê bûy.Dema berê çekê xu daye bin zikê wê û jorda bi agirve înaye xwarê.
Hingê nav ü dengê wî di nav hevalan da belav bû.
- Mala xudê ava.Heker dujmnî hinde firoke heban,da me qir kit.
Nihu tijî bersîngê wî firokene.Wek kutirên sipî xûya dikin.
Aax ..ax...Van firoka bisedan gond yên liwelatê me sotîn.Van firoka hizareha biçûk û jin û gencên me yên kuştîn.
Ev firoke dujmnên mene.Dujmnekî tirsnuk.Diçite ber esmanan.Û agirê kerb ü kina xu Berdidite hindav serê hejaran.
Dujmnekê bê dile.Şerekê bê şerev û tirsnuk dikit.
Dengê bilind bûyê pîstê wî zer kir.
Bilez qesta dergehê jinav firokexanê dête nav hola çaverê kirinê kir.
Hişik rawestîya.Çav lê zîq bûn.Dev lê beş bû. Gelek wesa ma.kes dîyar nebû,gelek hizir kirin. Gelek tirsîya.Gelek wastîya.
Gotinên hevala diserî da aşekê giran dihêran.
... Berî çend rojan,çend biçûk û jin lifirukexanê hatin girtin.Êkser hinartine welatên wan.. hinartine bexda.Hinartine berdestê dujmnî...
Êsker berze kirin...Berze kirin...Bexda... Dujmin....
Berî bikite hewar,berî serê xu lidîwaran bidit.
Xwîna dilê wî gerîya,pêla mirovan jidergehî beref dervey firokexanê dîyar bû.
Wek berxekî birisî,liberahîya kerê pezî rabû lîtka.
Çavên xu libejna xecê gêran.
Xecê gîro bû....Xecê nehat.

... Hindek biçûk û jin,yên hatîne girtin.Yên hinartîne welatên wan.Nav dujmnî. Bexda...
Xecê dîyar nebû,bêhna wî teng bû,mejyê wî şêlî bû.Lêvên wî hişik bûn.
Wek kumeka hestîya,dicihê xuda rawestîya. Livîn jê nehat.Ew deng û livîna lirex durên wî dihate kirin.Neşîyan tirsa wî verevînin.
Bêhna wî teng bû,divîya bikete hewar.Divîya qesta firokê bikit.Divîya xecê jinav destên dujmnî rizgar bikit.Berî bigehte birîyara xu kuştinê.
Berî şêro pişta xu bidite hîvîya dawyê.
Berî bidilê tijî tirs û kul,berf mal bizifirt.
Tijî çavên wî dîmenê xecê yê bê seruber bû.
Wek gilêşê lidawya lavawê diêt.
Xecê,herdû kiçên xu yên kirîne dibin kefşên xu ve.ü yên dibin ebayê reş da veşartîn.
Wek diza,bi çavên tijî şerm û tirs.Biduîv şopa mirovan,berev dergehî dihatin.
Şêro neşîya xu bigirt.Xu liser wê kutana libersîngî ra havêt.Û qesta xecê kir.
Ew polîsê liber dergehî,nevîya dilê wî bihêlit, nevîya xoşîya wî didifnada bînit.Rê bû vekir. Digel çû beref cihê xecê û herdû kiça.
Şêro xu havête kuma wan.Dane bersîngê xu ü givaştin.
Polîs ma lihîvîya wan.Gelek wesa man,hol vala bû,polîs necar bû.
Milên wan girtin,berf dervey holê hajotin.
Tirsa xecê bû rondik û girî.Herdû kiç,bûne qevteka tirs û pirsîyaran.
Şêro bû xurtekî çarde salî....!

- 21 –

Serê xu bilind kir.Çu tişt lipêş çavên xu nedîtin.
Bawşkên xewê dev lê beş kirin.Çav lê tarî kirin. Hizirên wî bû ne ewrên payîzî.Barana xem û kula jê dibarîn.
Wek mirovekê kure,destê xu liperdaxa avê gêra.Hindek ava tezî berda gewrîya tijî xew. Ava tezî,zêrevanên gehên wî hişîyar kirin.
Deng lihemû şanên leşê wî vedan.Çav lê zîq kirin.
Cih her ew cihe.Dujmin her ew çavên şîn û pirça zere.Çeper yê bê stareye.Çek yê çirüke.
Xu jêk kêşa,bawişkek jidevî derket.Zanî çu bê çê nabit.
Destên xu bilind kirin.Lipeyvekê gerîya suhbeta xu dest pê bikit..
- Rojekê,xecê milê min girt,wek zirteka.Ez bilind kirme bersîngê xu ü got..

Ji evro ü pêve nebêje min xecê.
Navê min ruza ye.Ez ruza berlînî me.Kes ne bêjte min xecê.Xecê mir,xecê nema wek wan roj û cihên jê hatî.
Ez ruza me...Ruza berlînî.Hewe zanî yan ne?!
Kenyê lêvên wî nexşandin.
- Ez jidil kenîm.Ew demekî gelek dirêj bû,ez nekenîm.Kenîya min digewrîya minda bû kuxik.
Xecê ture bû,limin kire hewar,xu nerazî kir.Û got..
- Tû dê her mînî reşkoyê şivan.Tû na êye gihurîn.
Min gotê xecê,dilê min nav ne çûye.Divêt tû ji mejyê xu bêye gihurîn,ne jinavê xu!
Dengê xu bilind kir,bidest û çava şer dikir ü got..
- Divêt tû jimejî bêye gihurîn.Nene,divêt tû jiserî heta binî bêye gihurîn.Seruçavên te.Bejin ü balate.
Divêt te bikine mekînekê û bihêrin,dibit bibîye mirovekê dî?!
Kenîya min zêde bû.Turebûna wê zêdetir bû.
Ez neçar bûm bêjimê ruza...
Ruza min?Çav şîna min?Pirç zera min?
Xudana pirça zer û çavên şîn.Serê xu bilind kir. Bişkurînek liser dêmê wî hate nexşandin.
- Wê zanî ez yê yarîya pê dikim.Hate hindav serê min ü got..
Bû zanîna te,ez duhî çûme fermangeha nasnaman,ü min daxwaza vî navî kir û....
Bê deng bû.
Ez dizanim gihurîna nava li elmanîya gelek bi zehmete.Taybet navê êkê.
Min bîrozbahîya wê kir.Min baş dizanî ez neşêm ji birîyara wê lêve kim.
Navê xecê limal û linav hevalên wê bû ruza. Ruza berlînî...
Serê xu şor kir.Çavên xu neqandin.Weku sovîyekê dîndar,lêvên wî dilerizîn.
- Xecê serubin hate gihurîn.Jîyana me kire duzex.Mayê xu dihemû livîn û axivtinên meda di kir.Çilkên xu guhartin.Pirça xu zer kir.Çavên xu şîn kirin.Zikê xu heta nafikê rüs kir.Xu kire elman. Xu kire berlînî.Her weku bab ü kalên wê xelkê nîva berlînê....
Ez neçar bûm bêjimê ruza.Hindek cara min jibîr dikir ü digotê xecê.Ez zû lêve dibûm û digotê ruza.Kiç û kurên wê digotinê ruza.
Lê xelkî yarî pê dikirin.Lume dikirin.Nedivîyan têkelîya wê bikin.Her çende xecê jî têkelîya kesên bîyanî nedikir.Taybet xelkê welatê me. Têkelîya wê tinê digel elmana bû.Hevalên wê elman bûn.Digel elmana kar dikir.

Navê wê bû ruza.Lê hindî kar kir,neşîya liser pasport û nasnama,vî navî danit.Xecê her ma liser pasport ü nasnamên wê.
Heval û nîyasên me navê wê kirine xeca berlînî.
Min gelek şerm ji xu dikir,min çu tişt pê çê nedibûn.
Xecê bû ruza.Gondê pirsî,bû berlîn.Tiraş û gelî bûne avahyên bilind.Pez û gov,bûne turmbêl û mîtruyên bin erdî.Vanus bû kahreb.Kuçik û tenür,bûne kumputer û tebaxên kahrebê...
Jîyaname ser ü bin bû.Gihurîn jişîyanên me zêdetir bûn.Bar jihêza me girantir bû.Herzû ez ketim bin pîya.Min xu liber negirt.
Xudana pirçê,hest bixav bûna leşê wî kir. Çargava qelemê xu sist kir.Bêhinvedanek da kaxezê.Tilên nazik yên jigivaştina qelemî sor bûyin.Havêtine gerdena perdaxa avê,biser gewirîya xûya şarîyay da kir.Lêvên wê yên sor terbûn.Biserê ezmanê xu lêvên xu vemalîn.
Çavên şîn,her ji enîya wî ya girê vene bûn.Xafil nekir.Heta serê wî yê giran ketî ye ser mêza dinavbera wanda....

- 22 –

Gehên leşê wî gurç bûn.Şanên pîstê wî bûne kurîşik.Qorkên çavên wî,tijî xuh bûn.Enîya wî bû mişarên birincî.
Livîna wî.Wek ya jina liber biçûkbûnê nexirî.
Ciliv vê diketin.
- Kiça te ya gehiştî ye xüşka xu jîyanê.
Hevalekî,berî çend roja licihê....Bibure.Lichê leş firoşan herdû dîtîne.
Xuh zêde bû,geh çirik bûn.Şan şîn bûn.Pîst zer bû...
- Kurên te diberzene.Piştî te xecê kuştî.Yên ji wî cihî birîn.Yên veşartîn.
Nîşa kesê nadin....
Livîn zêde bû,leş bû amîrekê utumatîk.Deng ji gewirîya hişik biserket.
- Hevalê xecê,kelexê wê licihekî taybet veşart. Nehêla em wek xu veşêrin.
Cubarên xuhê leşê wî kirine av.Bêhna wî şer digel gîyanê wî dikir.
Xecê jidûr,berev wî dihat.Bidestê rastê,destê kurê xu welat yê girtî.Û welatî destê birayê xu Kawey yê girtî.Û bidestê çepê herdû kiç wek qevteka kula bidüvra dibezîn.Wek dawetyên dil ter liber sîngê zirna bêjekî çillek rawestîyan.

Kenî û bişkurîn,jidêmên wan dibarîn.
Divîya jipêşve rabit.Divîya xu pavête nav kuma wan.Divîya gazî bikite wan.Divîya bikite hewar, neşîya.Hişik bû.
Xecê destê kur ü kçên xu berda û bixardan berev wî hat.
- Şêro...Dilê min,nerabe.Tû yê wastîyay.Eve ez hatim.
Kur û kiçan,wek berîkanê dane bidüv dayika xu û qesta babê xu kirin.
Şêro,rabû ser xu,destên xu vekirin...
- Heçyê berê kezî zerê..
  Heçyê berê kezî zerê....
Xecê berî hemûya xu havête dinav sîngê wî da. Kelevaş kire nav gîyay da.Xu havête ser sîngê wî yê germ.
Her biçûkekê gehiştîye kuma wan,wek mignatîsî xu havête ser kumê.Heta bûne gilomçkeka goştî û kenyê...
Bêhin hilkêşana wî sist bû.Geh xaf bûn.Şan nerm bûn.Xwîn hate bin pîstê zer.Xuh sar bû,leşê wî nüsek kir.Ta sarê girt!
Leşê xecê yê girim,û kuma biçûkan,neşîyan tasara leşê wî sist kin.
Pêlên sermayê jinav pîstê wî derketin.
Bû mirovê bevirê.
Xecê û biçûkên xu jiserma leşê wî revîn.Tijî dilên wan tirs û serma bûn.
Hêlan bitinê.Gelek gazî wan kir.Gelek hîvî jiwan kirin.Kes lê ne zivirî.
Divîya digel wan biçit.Divîya bigehite wan. Rabû serxu.Xu ditextê xuda havête xwar.
Ew hevalê hindek cara lizîndanê di ête seredina wî lihîvîya wî bû.
- Evîn û jîyan yên bûyine leş firoş.Welat û Kawe diberzene.Kelexê xecê,likurstana elmana veşartin.....
Min kes nema bû bijîm.Ez lihîvîya çi me?Ez bû kê dijîm?Min çi îna serê xu? Dengê polsekî,hemû tişt bidawî înan.
- Karê xu bikin,dû demjmêran herine nav baxçê girtîxanê,da roj lihewe bidit.Kes nemînte lijor...
Jor vala bû,şêro ma dinav nivînên xuda.Xewin û hizra pên wî qeyd da bûn. Hêşta dengê kenîya xecê û biçûkên wê tijî nav nivînên wî bûn.Hêşta ew hevalê hestîgiran raborta deng ü basên kiçên wî dixwand.Hêşta leşê wî tijî ta sar bû...
Jor bê deng bû.Jor vala bû.Kes nema.Cih şir bû. Serma zal bû.
- Kiçên te yên bûyine leş firoş.
- Herdû lichekî kar dikin.
- Berî dû roja hevalekî ditibûn...

Destê xu bire bin Balîfka sar.Tiştek jibin îna der. Bilind kire stêrka çavên xu.
Kenî....Girî....Kuxî....Carekadî jidil kenî...!

- 23 –

Destê xu bilind kire beranberî dêmê xu. Ronahîya gilopa bibanê jorê ve,kete wî devmuskê dinav tilên wî da.tîşka ronahyê çav lê tarî kirin.
Tila xu ya beranî.Liser devmuskî şidand.Rexê dî yê devmuskî,kete ser tila wî ya şehdê.
Serê devmuskî yê tîj,dibirsqî.
Dest bilind bû,serê devmuskî yê tîj.Kete ser riha stwyê wî ya stûyr.
Çavên xu neqandin.Şahde da.Reh wermî.Xwîn pengîya.
Navê xudê îna,bihemû hêza xu ew tîyê tîjê devmuskî,da bin riha stûyê xu.
Fizka xwînê kevalek liser dîwarê girtîxanê nexşand.....
- Xecê şo kir.
- Evîn digel xüşka xu bûne leş firoş.
- Welat heşîş kêşe.
- Kawe yê lichê bê xudanan..
- Min xecê kuşt.Xecê mir.
Evîn û jîyan bûne qehbe...Welat û Kawe berzebûn.Polîsa veşartin...Kelexê xecê linav elmana veşartin....
Kelexê şêro ma bê xudan....
Bajêrvanîya berlînê necar bû,likurstana bê xudanan birex gorê xecê ve.Kelexê şêro bin ax kirin...!!